

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

bîrnebûn

PAYÎZ/2008

"Panzde salî bûm çûm ser hewîyê"

Îbnî Xelikan û Bermekîyan

1919-1923 yılları arasında Mustafa Kemal Atatürk'ün Kürt Meselesi karşısındaki tutumu ve 1922 tarihli Kürt Otonomisi Kanununun Metni

39

bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carê derdikeve / Üç ayda bir çıkar.

Utges av Apec-Förlag AB

Hejmar 39, payiz 2008

Ansvarig utgivare

Ali Çiftçi

Redaksiyon

A. Çiftçi, Dr. Mikailî, H. Erdoğan, M. Bayrak, İ. Türkmen
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran

Adress

Navnişana li Swêdê

Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige

Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post

info@birnebun.com

Internet

www.birnebun.com

Têkili/İlişki

Danimarka: Irfan Baysal, 0045-27 11 58 83

Avusturya: Cüneyt Dagdalan, 0043-69 91 11 55 294

Belavkirin / Dağıtım

Ewropa: Muzaffer Özgür/Birnebûn

Postfach 900348 , 51113 Köln / Almanya

Tfn: 0049-(0)172 298 24 51

Türkiye/Ankara:

Dipnot Kitebevi, Selanik Caddesi No: 82/32

KIZILAY / ANKARA

Tfn: 0312-419 29 32

Anatolia Muzik Center

Cumhuriyet Mah. Turan Cad. No: 29 A

Polatlı-Ankara

Tfn.: 0090-312-622 94 36

İstanbul: Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasajı No: 258/6, Beyoğlu

Biha/Fiyatı

Europa: 5 Euro • Türkiye: 2,5 YTL

Abone

Swêd: 400 SEK • Almanya 40 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

İsveç hesap numarası

(Birnebûn) postgiro: 468 65 12-7

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê / İsveç dışındaki aboneler için

APEC, "Birnebûn" PlusGiro-Stockholm/Sweden

BIC: NDEASESS

IBAN: SE85 9500 0099 6026 4686 5127

Çap / Baskı

Apec-Tryck AB



Her nivîskar berpîrsê nivîsa xwe ye.

*Mafe redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê re
tên, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li
xwedîyan nayên vegerandin.*

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û

Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.



Wêneya li berga pêşîn:
Baxçê Eysê û gundê Bêşqewaxê
Foto: A. Tigrîs



- 2 Ji Bîrnebûnê, *Alî Çiftçî*
- 4 Li Danmarkê kursa zimanê kurdî, *Amed Tîgrîs*
- 6 Apec û Spîrêz di fûara pirtûkan a Goteborgê de, *Amed Tîgrîs*
- 8 Îbn Xelîkan û Bermekîyan, *Nuh Ateş*
- 14 Mîrê Botan û Mîrê Behdînan, *Jordan*
- 15 Cîgerxwîn, *Mem Xelikan*
- 20 Mezelê Susizê, *Red*
- 21 Li ser cemedê jîyanek, *Uskê Cimik*
- 27 Qenere, *Seyfî Dogan*
- 30 Bi zaravê Xelikan, ÇAV, *Nuha Ateş*
- 33 "Panzde salî bûm çûm ser hewîyê", *Altun Başaran*
- 35 Zimanên koloniyalî hîn fermî ne, *Nuh Ateş*
- 37 Şeverêşên sêwî, *Xîzan Şîlan*
- 39 Çarmêxa Îsa, *Hamîte Hinare*
- 40 Li Swêdê bi îstatîstîkên nû perwerdeya kurdî û şiroveyeke giştî
- 44 1919-1923 yılları arasında Mustafa Kemal Atatürk'ün Kürt Meselesi, *S. Ghalib*
- 50 Türk – Kürt Ulusal Paktı
- 54 İki Belge
- 57 Koçgiri Ayaklanması üzerine bir özet
- 60 Lozan Konferansı'na Doğru
- 64 Sonuç
- 67 1922 tarihli Kürt Otonomisi Kanununun Metni

Perwerdeya bi zimanê kurdî pêwîstiyeka jiyana rojane ye

Di van rojên payîzê de, dîsan guh û çavên dinyayê li ser kurd û Kurdistanê ye!...

Em bixwazin an na, bi dilê me be, an na, bi ci awayî dibe bila bibe, çênabe ku em wek kurd di aktualîteya rewşa mîletê xwe de, bêdeng, bêhêvî û bêdaxwaz bin!

Belê, piştî hewqes qurbanî û fedekarî, hê jî xelkê me yê bakur bêmaf e û di warê kesayetiya xwe de jî bêxwedî, li ser axa xwe wek pêner dijî.

Mîletek wek me kurdan, ku ji pir aliyan ve xwedî kewneşopiyeka dewlemend e û hê jî li ser axa xwe bêxwedîdewlet e, tune! Ne tene bêdewlet bûn, di wê dema ku di her aliyê pêşketiyên teknikîyên agahdariyê de jî em wek kurd hê nikarin bi zimanê xwe zarokên xwe perwerde bikin!

Zimanê ku di perwerdeyê û hînbûnê de neyê bikaranîn di pir aliyan de lawaz dimîne. Peyder pey li pey zimanên din dikeve û ber bi windabûnê ve diçe! Îro rewşa zimanê me jî di proseka wiha de ye.

Di van rojan de li seranserê Kurdistanê bakûr û li Tirkîyê daxweza perwerdeya bi zimanê kurdî tê kirin. Ji bajarên Kurdistanê bi hezaran însan bo

mafê xwe yê herî bingeîn, meşîyan. Ew herçiqas pir bi derengî ketibe jî bi ya min daxwazeka pir di cîh de ye û divê ne tenê bibe aleteka propagandaya hêzên siyasî!... Lê divê ev daxwaz bibe daxwaza pêwîstiyeka jiyana rojane.

Ew daxwez ji aliyê her kurdekî û herwiha ew kesên ku dibênin em mafê însanan diparêzin û demokrat in ve divê bêt piştawjî kirin! Ji ber ku ew mafê her însanekî ye û pir tabî ye!..

Kengê însanên me bi daxwezên bo mafên xwe yê pir tabî ve derketine meydanan, dewleta tirkan her bi darê zorê bersiva xelkê me daye!..

Balkêş e, di van rojana de li hember van daxwezên mefê perwerdeya bi zimanê kurdî tê kirin, rêvebirên Tirkîyê her dîsan dixwazin bi şer bersivê bidin û haziriya şer dikin.

Dema hîlbijartin nêzik dibin tu dibînî ew partiyên tirkan bi her awayî xelkê me, bi rêya baweriya dînî be an jî ji aliyê aboriyê ve be, dixapînin, dibênin; *em birayê hev in, em giştik misilman in, qedera me bi hev re ye*. Bi dengên wan tên ser hukum û piştî jî wan gotinên xwe yê berî hîlbijartinan her di cîh de ji bîr dikin.

Nimûnên wiha hertim di dema hil-

bajartinan de dubare dibin! Ev ji dema dewleta Osmanî vir ve her wiha bûye!... Pir mixabim, di dema niha de jî xelkê me bi polîtîkayên wiha hêjî tê xapandin!...

Belê, girîngiya perwerdeya bi zimanê kurdî; em di van salên dawîn de dibînin ku di nav ciwanên me de hişjariyek dest pê kiriye. Li koka xwe, li zimanê xwe xwedî derdikevin. Li welêt xwendekarên universîteyan ji bo perwerdeya bi zimanê kurdî, civînan li dar dixin û di nav xwe de kursên zimanê kurdî organize dikin. Nimûneyeka weha ya hişyarî û xwedî li keseyatiya xwe derketin, li derveyî welet li Danîmarkayê bi kurseka du hefteyî, ji aliyê xwendekarên kurdên li Danîmarkayê destpê kir. Xebera vê kursê bi sernivîsa *Li Danîmarkê kursa zimanê kurdî* di vê hejmarê de hatiye weşandin.

Birêz Nuh Ateş bi sernivîsa *Îbnî Xelîkan û Bermekîyan* nasnameya Bermekîyan bi me dide nasîn. Di vê nivîsa balkêş de jî li ber çavan e ku dema mîletek bêdewlet be, jêhatiyên vî mîletî çawa li ser hinekên din tên hesabandin.

Bi sernivîsa *"Panzde salî bûm çûm ser hewîyê"* Altun Başaranê sohbetek bi du jinepîrên ji gundê Altilera û Omera re kiriye. Sohbeteka pir balkêş e. Ev mesela hewîtiyê di civata me de çing

dibûye û jin vê meselê çing jiyane, bi zimanekî xweş bo me diyar dike.

Bi sernivîsa *Qenere*, birêz Seyfî Dogan aliyekê ciwata me ya gundîtiyê ya din bi zaravayê xelika bo me dide nasandin. Di vê kurtenivîsê de dema bahsa şiwantiyê û hekatên wê demê tên kirin em rastî bi dehan gotinên kurdîyên ku li ber windabûnê ne, rast tên. Bi xêra vê nivîsê bi kêmasî deh kelîmeyên ku li ber windabûyîna ne hatine berhevkirin.

Ji ber aktualîteya mijarê, em gotareka ku ji aliyê Sabah Ghalîb ku di 2005 û 2006 an li unîversîta Silêmanyê û Koyê bi kurdî hatiye dayîn, bi wergera birêz Agit Khorshid Zaher, bi sernivîsa *1919-1923 yılları arasında Mustafa Kemal Atatürk'ün Kürt Meselesi karşısındaki tutumu ve 1922 tarihli Kürt Otonomisi Kanununun Metni* di vê hejmarê de bi tirkî diweşînin.

Gotar û belgeameyeka bo me kurdan pir girîng e! Divê her însanê me vê belgeameyê bixwîne û pê bizane ku Mustefa Kemal Atatürk di destpêka avakirina Tirkiyê de kurd çawa bi kar anîne û înkariya kurda çing bûye îdeolojiya resmî ya dewleta tirka ku hêjî li hember kurdan tê bikaranîn!

Heta hejmarê bê, bimînî di xêr û xweşiyê de!

Ali Ciftci

Li Danîmarkê kursa zimanê kurdî

Amed Tigrîs

Komela Xwendekar û Akademîsyenên Kurd li Danîmarkê bi hevkarîya weşanxaneyê Apecê di roja 11ê tebaxê de li bajarê Kopenhagê kursa hînbûn û hînkirina zimanê kurdî vekir ku ez mamostetiya wê bikim. Kursê heta 19ê mehê dom kir. 18 xwendekar beşdarên kursê bûn û piraniya beşdarên xwendekarên zanîngehê an jî zanîngeh qedandibûn.

Giraniya kursa li Danîmarkayê li ser xwendin û nivîsandina kurdî bû. Ji ber ku hemû xwendekar bi kurdiya devkî dizanibûn. Di nav xwendekarên de ji her aliyê Kurdistanê xwendekar hebûn lê bi piranî kurdên ji Anatoliya Navîn bûn.

Kursa zimanê kurdî gelek bala kurdên li Danîmarkê kişand û loma çend dem û dezgehên kurdên li Danîmarkê daxwaz dikin ku di rojên pêş de ji bo endamên xwe kursên bi vî rengî vekin. Herweha ne tenê li Danîmarkê li gelek welat û bajarên Ewropayê kurd dixwazin beşdarî kursên zimanê kurdî bibin û ji dem û dezgehên xwe dixwazin ku li bajarên wan jî kursên kurdî dest pê bikin.

Komela Xwendekar û Akademîsyenên Kurd li Danîmarkê û Weşanxaneyê Apecê li Swêdê hewl didin ku di rojên pêş de, bi vî cureyî li seranserê

Ewropayê kursên zimanê kurdî vekin. Wek dibistaneke seyar li welat û bajarên Ewropayê çerx bibin û bigerin.

Dîtinên xwendekaran

Di dawiya kursê de çend xwendekaran di derbareyê kursê de hest û ramanên xwe weha anînên zimên:

Necatî: Min ji kursê gelek fêde dît. Berî hefteyek ez nikaribûm bi kurdî bixwînim. Niha piştî hefteyekê ez êdî bê problem dixwînim û dinivîsînim. Kêm be jî ez gramer û rastnivîsîna kurdî hîn bûm. Min heta îro di civînan de bi tirkî deng dikir, êdî ez bi kurdî deng dikim. Li cem min gelek pirtûkên kurdî hene, lê mixabin min nikaribû ez bixwînim. Min dest pê kiriye û êdî ez ê yek bi yek bixwînim. Ka de werin li vî ecêbe binêrin, em bi çend zimanên xerîb dizanin lê bi zimanê xwe nizanin. Ev kurs ji bo me destpêk bû, em ê hîn çend kursên weng vekin.

Mehtab: Heta berî vî kursê min nikaribû ez bixwînim. Dema ez alfabeya kurdî hîn bûm, êdî bi hêsanî şe dikim bixwînim û binivîsim. Bi xwendin û nivîsandina kurdî re em gelek tiştên din jî hîn bûn. Wek nimûne em rojê 15-20 term û peyvên kudî yên ku di



Dîmenek ji kursa zimanê kurdî li Danmarkê

zimanê dengkirinê de kêmtên bi karanîn an jî nayên bikaranîn em hîn bûn. Ez êdi dikarim bi kurdî pirtûkan bixwînim û xwe bi pêş bixim.

Eyupxan: Ez bi xwe mamoste me û ji bajarê Amedê me, lê heta niha min nikaribû ez bixwînim û binivîsînim. Min di vê kursê de kilîta xwendin û nivîsandina kurdî fêmkir. Alfabe û bingehê gramerê fêmkir. Ez ji vir bi şûn de xwe bi xwe bi pêş dixim. Min vê havînê ji Amedê çend pirtûkên çirokan kirin ku ji keça xwe re bixwînim, lê zehmet bû. Niha ez ê her êvar wan çirokan ji keça xwe re bixwînim. Ez li vir mamostetiya zimanê tirkî jî dikim. Ez ê hewl bidim ku ji vir şûn de mamostetiya zimanê kurdî bikim. Çima na?!

Özgür: Ez ji wek hevalên din min

bi kurdiya dengkirinê dizanibû, lê min ne nedikir ku bixwînim û binivîsînim. Êdî ez dixwînim û dinivîsînim. Lê ev kurs têrî min nekir divê çend hefteyên din jî hebûya baştir dibû. Min ji vê kursê pir fêde dît.

Xezal: Erê ez jî ho bûm, dixwînim û dinivîsînim. Berê Ap El ji min re pirtûkên kurdî tanî, min ne nedikir bixwînim. Li mala me pirtûkên min pir in. Min li fotografan mezê dikir. Ez êdi dikarim bixwînim û binivîsînim. Ez ê nivîsên li bin fotografan jî bixwînim¹.

1 (*) Xezal herî biçûk û gula kursê bû. Ew 14 salî bû bi xwendekarên unîversîte re dihat kursê. Ji gelek baştir û rastir dixwend û dinivîsand. Ji bo helwest û hewesa wê me pirtûka "Xuşka min li ku ye" diyarî da wê.

Apec û Spîrêz

di Fuara Pirtûkan a Göteborgê de

Amed Tigrîs

Fuara Pirtûkan a Göteborgê di 24 mehê de deriyê xwe ji pirtûkfiroş, pirtûk-kirox, nivîskar, hunermend, muzîsyen, semînerdar û mêvanan re vekir. Îsal 24.emin a Fuara Pirtûkan a Göteborgê ye. Wek dewlet hevkar û beşdarên Fuara Pirtûkan a Göteborgê li gel dewleta Swêdê ev dewlet jî hene û cihên xwe vekirine: Almanya, Avustraliya, Avusturya, Bulgaristan, Çîn, Danîmark, DYA, Finlandiya, Fransa, Hîndistan, Holland, Îngilistan, Îrlanda, Îskoçya, Îsland, Îsrail, Kanada, Letonya, Lîtawiya, Lubnan, Misir, Nîjerya, Nîkaragûa,

Norvej, Polonya, Portekîz, Romanya, Sîriya Leon, Swîsre û Ukrayna

Her sal welatek dibe Fokusa Fuara Pirtûkan a Göteborgê. Îsal jî welatê ku fokus li ser e, Letonya ye. Serekwezîrê Letonayayê Invars Godmanîs bi şandekê mezin ku bi dehan siyasetmedar, weşanger, rojnamevan, nivîskar, hunermend û muzîsyen di nav de bûn beşdarî fuarê bû û di fuarê de axivî. Afîş, nivîsar, semîner û hemû alavên masmediyayê li ser welatê fokus e: ji her aliyê ve dîrok, wêje, ziman û çanda Letonayayê tê nasandin.

Bernabeya Fuara Pirtûkan a Göteborgê





îsal gelek dewlemend bû. 435 semîner hat dayîn. Ji 30 welatan 800 semînerdar beşdar bûn. Guhertin û nûbûneke sala îsal ev e ku mirov roja yekşemê dikare bi bilêta xwe bêpere semîneran guhdarî û temaşe bike. Heta niha beşdarbûna semînerên mezin û pilebilind bi pere bû. Ji derî van semînerên mezin û pilebilind li gelek salonan semîner, konser û civîn hene ku berê bêpere bûn û niha jî bêpere ne.

Di bernamêya îsalîn de balkêşiyêke din jî ev bû ku Letonya, Romanya û welatên cîran bi hevkarîyêkê Muzexaneyê Dunyayê ava kirin.

Di Fuara Pirtûkana Göteborgê de du weşanxaneyên kurdî jî beşdar bûn. Ji Duhokê weşanxaneya Spîrêz û ji Stockholmê jî Weşanxaneya Apecê. Ev du sal in ku Spîrêz û Apec li gel hev li yek cihekî pêşangehê vedikin. Di pêşangehê

de nivîskar Hesenê Metê, weşanger Ahmed Mîlan û helbestvan Selwa Gulî û gelek kurdên devera Göteborgê serdana cihê APEC & SPÎRÊZê kirin, li montera wan sohebtên cûr be cûr li gel Xwedî û berpîrsê Spîrêzê Mueyed Teyîb û yê Apecê Alî Çiftî kirin.

Di Fuara Göteborgê de pirtûka Ingmar Karlsson a bi navê *"Kurdistan landet som icke är"* aktuel e û balê dikşîne. Roja pêncşemê Ingmar Karlsson bi xwe pêşengeha Apec û Spîrêzê zîyaret kir û demke kurt bi berpîrsên weşanxaneyên kurdî û nivîskarên kurd re sohbet kir.

Îsal 949 fîrma û weşanxane li fuarê cih vekirine. Roja pêncşemê 21144 kesan zîyaret kirin û roja îne ev hejmar derket 49 976. Diyar dibe ku roja şemî û yekşemiyê dê ev hejmara beşdaran zêdetir be.

ÎBNÎ XELIKAN Û BERMEKÎYAN

Nasnameya Bermekîyan

Nuh Ateş

Gava ku meriv navê xelikan (khallikan) û bermekîyan (barmakiden) dide gogolê û pişkoja lêgerê çirt dike, bi dehan nivîs tên ber wî. Meriv bi vê têdîgihê ku van herdu navan li ba miletên din û di ber gîştan jî li ba elîtên wan giran û nas in.

Çima van navên hana di qada navnetewî da nas û bi rûmet in?

Navê xelikan jî avûrûyên bîyografvanê bi nav û deng, Lawê Xelikan (Îbnî Xelikan) nas û navdar e. Navê bermekîyan jî di saya malbata bermekîyan ya ku di dema xelîfetîya ebbasîyan da wezîrtî kiriye bi şan û şohret e.

Lê tiştê di vir da bi bed ew e ku di piraniya çavkanîyên dervayî da Lawê Xelikan wekî zana û bîyografvanê bi eslê xwe ereb û malbata bermekîyan jî wekî faris tên zanîn û nasandin (wîkîpedîa: Îbn Khallikan û Barmakiden). Va jî ji xêrneditîya kurmancan û hesudîya neyarên wan tê. Kurmanc bê dewlet in û lewma her çêşid heyî û hêjayîyên wan bi ser xelkê da tên berdan û li wan tên mahrkirin.

Lawê Xelikan (1211-1282)

Lawê Xelikan li Hewlêrê hatiye dunyayê. Nav li ser e, ew î ji eşîra Xelikan e (Mehrdad R. Îzady, *Kürtler*, weşanên Doz, r. 158). Îbnî Xelikan navê wî yê kurt e. Di nivîsa li ser Îbnî Khallikan ya di wîkîpedîayê da navê wî yê dirêj wer hatiyê nivîsîn: Ahmed b. Muhammed b. Îbrahîm Abul Abbas Şamsedîn al-Barmakî al-Îrbîlî al-Şafîhî. Lawê Xelikan di esera xwe ya li ser navê "Wafayet al-ayan wa-anba abna az-aman" (jîniya kesên meşhur û haydarîyên li ser lawên zemanê xwe) jîniya 900 kesî nivîsîye. Hêjayîya kar û eserên wî mela xelkê û di ber gîştkan jî ya derûdorên zanîyar û akademîkar kişandîye û dikşîne. Nimûne, dersdarê Unîversîteya Berlînê, Gerhard Wedel di salên 2002-2004 an da bi profesora oryantâlîsmê, Dr. Renate Jacobî va tevhev projeyek li ser kar û eserên Lawê Xelikan çekirine (<http://web.fu.berlin.de>).

Şayanî gotinê ye ku Lawê Xelikan ji xêyrî karê nivîsîna bîyografya li Şamê û Misirê qaditî û serqaditî kiriye.

Di çavkanîyên kurmancan bi xwe da Lawê Xelikan ron û aşkere wekî kurmanc tê nasandin û navê wî di nav kurmancên zana û navdar yê ku bi erebî nivîsîne da tê heldan (M. Emîn Zekî, *Kurdistan Tarihi*, weşana beybûn, r. 159, û M. R. Îzady, e. ç, r. 97).

M. Emîn Narozi ji esera Lawê Xelikan beşa li ser Selaheddîn Eyyubî ji erebî wergerandîye kurmancî û weşanxaneyê Avesta jî ew wekî kitab weşandiye. Di pêşgotina xwe da Narozi qala gundekî Hewlerê yê nêzikî Herîrê û bi navê Xelekan dike. C. Rojbeyanî gundê Xelekan li gelîyê Xelekan û nêzikî Koysanxaxê bi cih dike (Şerefxan Bedlîsî, *Şerefname*, weşanên Apec, jêrenot 194, r. 480).

Li gorê pêşgotina Narozi Lawê Xelikan bixwe kokê xwe digihîne bermekîyan.

Dr. Ebdulmecît Şexo di lêkolîneke xwe da navê Lawê Xelikan, wekî Ehmed Lawê Mihemed Lawê Ibrahîm Lawê Bekir Lawê Xelekan heldide û ji Lawê Xelikan neqil dike dibê "bermekî ji êla zerariya kurdî ye, ew nasdarîrîn êl ji bermekîyan bû" û pê da dihere dibê, "Xelidê bermekî bavpîrê bavpîrên Lawê Xelekan e" (Dr. E. Şexo, di dîrokê da bi gelemperî pêwendîyên kurd û ereban 2: www.rojava.net.)

Ma va çing dibe, Lawê Xelikan xelikanî yan bermekîyanî (zerariyayî) ye?

Yan jî bermekîyan / zerariyayî bi xelikan va çî ye hevdûdu dikan, xisimtî û mermalîtiya wan xas heye?

Nêzikbûyînek di navbera wan da heye, lê detayên wê nayên zanîn. Ji van dîtînan û haydarîyan û ji navlêkirina Lawê Xelikan meriv dikane derbixe ku Lawê Xelikan him xelikanî û him jî bermekîyanî ye. Meriv dikane vê wekî gumaneke nêzikî rastîyê bihesibîne.

Kî dizane, dibe ku malbat yan qebîleke bermekî ji eşîra zerariya ji ber sedemên ku em pê nizanin veqetî û teve xelikanîyan bûbûye!

Li derên din çing e nizanîm, li ba kurmancên nava Anatolîyê îro jî piraniya gund û qesabayên wan bi navê eşîrê tên binavkirin û nasîn. Nişteciyên gund û qesabayan di nav xwe da hevûdu bi navê qebîle yan malbata xwe û lê li dervayî gund û qesabayê bi navê eşîrê binav dikan yan didin nasîn. Li gorê vê, Lawê Xelikan xelikanî û ji qebîleya bermekîyanî ye. Lê va jî, çiqas nêzikî aqila be jî wekî gumaneke dimîne.

Pêzanîyên di dest da têr nakin ku em bersiveke zelal bidin pirsên di derbarê mijara pêwendîyên xelikanîyan û bermekîyan û nasnameya Lawê Xelikan ya eşîrtî û qebîletî.

Di cihê xwe da ye ku li wir kurt çend malumat li ser xelikan bên pêşkêşkirin. Li gorê haydarîyên

aşkere eşîra xelikan li cografyake fereh bi cih û war e. Nimûne, meriv li Îran (Kirmanşah, Maku), Xorasan, Turkmenistan, Ermenîstan û Tirkîyê (Wan, Beyazîd, Semsur, Konya) rastî kom û komikên vê eşîrê tê (Îzady, r. 160 û Celîlê Celîl, XIX. *Yüzyil Osmanli İmparatorlugunda Kürtler*, weşanên ozge, r. 28 û Üskê Cimik, Xelikan Tarihî: www.xelkedondurme.com, beşa dîrok). Îzady kokê Xelikan digihîne keldanî û haldaniyên antîk û wer dibê: "li gorê qeyidên kevn yên ku hebûna xelikan nîşan didin, herêma navberê bakûrê gola Wanê û Erzîrumê wekî cih û warê wan tê heldan. Xelkanî neviyên keldanî / haldaniyan ne û di serdemên antîk da li dora gola Wanê berek ji yekîtiya xelkên hurî bûn" (Îzady, e.ç. r. 157, 161).

Ma bermekîyan kî ne?

Di wîkîpedîa da li ser bermekîyan wer tê gotin: "malbateke faris e ku di dema ebbasîyan da serdarê dewletê bû. Ew ê berê zerdeştî bûye (li gorê çavkanîyekê budîst bûye) û ji Belxê ye û di pêy zeptkirina rojavaya Îranê vegeyîye ser dîne îslamê."

Belx îro bajarekî Efganîstanê ye, lê berê bi ser Xoresanê va bû. Xoresan berê herêmeke mezin bû û bajarên wekî Semerkand, Buhara (Ozbekistan), Herat, Gaznî, Qebul (Efganistan), Meşed, Tus, Nişpur (Îran) û Merw

(Turkmenistan) jî bi ser erdê wê va bûn. (wikipedia: Choresan)

Ji serdemên kevn pê va kurmanc û bav û kalên wan li Xoresanê jiyane û dijîn. Li gorê Îzady îro nifusa kurmancên Xoresanê 2 milyon in (M.R. Îzady, e.ç. r. 38 û Şoreş Reşî, Reşîyanlar û Canbeg-Kolik-Xoresan: www.xelkedondurme.com. beşa dîrok)

Ferhenga Meyers Grose Konversations - Lexikon jî bermekîyan weng dide nasîn: "paşmayîyên barmakê hêkîm û rehîbê ji Belxê ne. Malbateke faris e û di bin hukumdarîya ebbasîyan da meqamekî bilind bi dest xistiye. Xalîdê lawê Barmak di dewra herdu xelîfeyên ebbasî yên pêşîyê da nêzikî textê hukumdarîyê bû. Lawê wî Yehya mamosteyê Harûn Reşîd bû û di dema xelîfetîya wî da wezîrtî kiriye." (www.zeno.org/Meyers-1905/A/Barmekiden)

Şerefxan Bedlîsî di Şerefnameya xwe da qala bermekîyan dike û kokê mîrên eşîra suwêdî (sewêdî) digihîne bermekîyan û kokê bermekîyan jî digihîne melîkên farisan û binemala eşîra suwêdî jî digihîne ereban. Li gorê haydarîyên ku Şerefxan dide, bermekîyan wezîrtî û serwezîrtîya xelîfeyên emewî û ebbasîyan kiriye. (Şerefxan Bedlîsî, e.ç. r.276-284)

C. Rojbeyanî di derheqa serhatîya bermekîyan da haydarîyên tenekî ji vê

cihê dide: "Ji Turkîstanê bi leşkerên dijî emewîyan re hatin Îraqê û ji bo demezrandina dewleta ebbasî gelek tekoşîn. Çar kes ji wan gelek bi nav û deng bûn:

1) Xalid: Bi Ebû Muslîm ra hat Îraqê û bû wezîrê Ebbasê xwînrij.

2) Yehyayê Kurê Xalid: Ebû Cehferê Mensur Azerbaycan daye û Mehdî kir wezîr.

3) Fedlê Kurê Yehya: Di dema Harûn Reşîd de bû wezîr.

4) Cehferê Kurê Yehya: Wezîrê Harûn Reşîd bû. Di dema Cehfer de fermana qira bermekîyan derket". (Şerefxan Bedlîsî, e.ç. jêrenot 350, r. 499) Li gorê vê bermekîyan 50 salî zêdetir wezîrtî kiriye.

Lê Dr. Ebdulmecît Şexo dibê, bermekîyan dema ebbasîyan 17 salan desthilatdarî kiriye. Gerek e bê gotin ku hinek malumatên di van çavkanîyan da ji hinek cihêtan da li hev nayên.

Tê gotin ku di dema xelîfetîya emewîyan nêzikî dawîyê bûbû da, li Xorasanê fermanarekî emewîyan bi navê Azad yê ku di bin fermanariya walîyê Îraqê da bû, navanda textê serdarîyê ji paytexta Xorasanê, Merwê kişandiye Belxê. Wî xwaztîye ku bajarê Belxê îmar û nûva bike û Dîhقان Barmak kiriye serdarê vî karî (Jûlius Wellhausen, Das Arabische Reich und Sein Sturz, r. 29). Bi vê jî meriv têdigi-

hê ku malbata bermekîyan li Belxê jî di karê îmar û îdareyê da jîr û jêhatî bûye. Ev Dîhقان Barmakê ku Wellhausen qalê dike, bavê Xalîdê Bermekî ye. Li gorê vê çavkanîyê, Dîhقان Barmak ji "Neubahar"ê ye. "Neubahar" (Nubahar) dibe ku Buhara be.

Dîhقان leqeb e û tê meneya esîlzade û êhtimal heye ku koka wê digihê gotina "dehkanan" ya partî / farisî.

Ji çavkanîyan dertê ku bermekîyan wekî malbateke esilzade di serdema part û sasanîyan da jî xwedîyê leqeb û meqam û tecrubeyên sazûmankariyê bûne. Li ba sasanîyan çar leqeb ji bo rêzên esilzadeyan hebûn. Rêza pêşî a serdaran (qiral) bû. Di pey va bi dorê vazpûran, vuzurgan û azadan dihatin. Çavkanîyên ereban rêzek din ya bi navê dehkanan heldidin. Dehkanan leqebê dewlemend û serdarên herêmên piçûk mîna gundan bûye. (Josef Wiesenhöfer, Das Antike Persien, r. 191, 231)

Dawîya wezîrtîya Bermekîyan

Ebbasîyan (750-1058) di saye serheldana di bin serkêşîya Ebû Muslim Xorasanî da textê xelîfetîyê ji dest emewîyan girtin. Piştbazên serheldana Ebû Muslîm pîranî îranî û xorasanî bûn. Yê ku li dijî zilm û neheqîyan û dijî zordariya emewîyan û bi zorê islamkirinê derdiketin li dora Ebû Muslim kom bûbûn. Cîgerxwîn

serheldana Ebû Muslîm wekî şoreş û destpêkîya fermanariya kurmancan bi nav dike.

Ebû Muslîm Xoresanî jî kurmanc e. Mêrxas û sazûmanzanekî li ser xwe bûye. (M. E. Zekî, e.ç. r. 60 û Cîgerxwîn, *Tarîxa Kurdistan I*, weşanên Roja nû, r. 140) Lê di çavkanîyên dervayî da navê wî wekî egîtekî faris î netewî derbas dibe. Di dewra ebbasîyan da, di qada serdariyê da para îranîyan (faris, kurmanc û yên din) ne piçûk bû. Ebû Muslîm bû hukumdarê Xoresan û rojavaya Îranê, lê pir neçû bi destê xelîfeyê ebbasî hate kûjtin.

Sazûman û tevgêrzanîya Bermekîyan jî rewayî gotinê ye. Bermekîyan ji destpêka dema xelîfetiya ebbasîyan pê va bi dehan salan li ser textê wezîrtiyê rûniştin. Dema wezîrtiya wan dema dewleta ebbasîyan ronaktir bû. Avadanî, zanîstî, huner û wêje pir pêşketî bûn.

Her ku zeman rabirîtiye bermekyan jî bare xwe dagirtîye û pir bi hêz û dewlemend bûne. Tê gotin ku wan êdî xwe di ser Harun Reşîd ra diditîne. Mal û milkê wan weqas pir bûye ku nedihatîye hesabkirin. Hukmê wan di nava dewletê da, bi taybetî di qada desketî û xercîyên xezîne da her çûye zêde bûye. Ji rûyê vê da xêrnexwaz, hesud û neyarên wan jî pir bûne û wan Xelîfê Harun Reşîd sor kirine û berdane bermekîyan. Sewa vê, Harûn Reşîd yê ku

li ber destê Yehyayê Bermekî mezin û şîret bûye û şîrê Jina Yehya mêtîye, lawê Yehya û şîrbirayê xwe, Cehfer daye kujtin û bav û birayên wî jî avêtine zîndanê (Ş. Bedlîsî, e.ç. r. 277,278 û Dr. E. Şexo, e.ç.)

Tarîxzanê ereb Îbnî Xaldun jî kûjtinê Cehfer û zîndankirina bav û birayên wî bi zêdebûna qudret û nifûza bermekîyan va girêdide. Li gorê rîwayetekê jî dilketî hev bûna Cehferê bermekî bi xwanga Harun Reşîd, Abbasayê va bûye sebeba kûjtin û perîşankirina bermekîyan. Tarîxzanê faris Tabarî qala vê rîwayetê kiriye û li ser vê belav bûye. Abbase xwanga Harun Reşîd ya ji bavê da bû. Dîya wê îranî bû. Harûn Reşîd bi zewaca wan razî nebûye û nehîştîye ku ew bigihên mirazê xwe. Lê Abbasa û Cehfer bi dizîkî mîna jin û mêrê hev jiyane û cêwîyên wan (du law) bûne. Wexta ku Harun Reşîd va bîhistîye ji rê derketîye, berê Cehfer daye kujtin û bav û birayê wî jî avêtine zîndanê, paşê xwanga xwe û her dû lawên wê dane kujtin.

Dilketîya Abbasa û Cehfer di serdema me da bûye mijara lîteraturra Ewropayê, romana frensî bi navê "Abbasa" (1753) ya Aîme Gîron û "Les nuits de Bagdat" (1904) ya Albert Tozza ([http:// de. Wikipedia.org/wiki/ Abbasa](http://de.wikipedia.org/wiki/Abbasa), [www. û www.jadu.de/mittelalter/index.html](http://www.jadu.de/mittelalter/index.html), das Abbasidenkalifat; Harun Al – Raschid).

Nasnameya Bermekîyan

Ma dîtîn û îdîayên di çavkanîyên der-
vayî da yên ku bermekîyan bi nasna-
meya etnîyî wekî faris didin nasîn çiqas
rast in? Li vir taybetiya bi ber çavan di-
keve ew e ku kesên dîtîn û îdîayên han
pêşkêş dikin, ji boyî vê tu çavkanîy-
an helnadin û tu delîlan nanimînin.
Lewma jî bi ya min meriv dikane dîtîn
û gotinên wan wekî gumanên sist û ji
rastîyê dûr bi nav bike.

Cihê bibîranî ye ku Lawê Xelikan
bixwe kokê xwe digîhîne bermekîyan.
Ji ber vê, eger em bermekîyan wekî fa-
ris bihesibînin, hîngê gerek e ku Lawê
Xelikan jî wekî faris bê qebûlkin. Çi
heyf e ku kêma çavkanîyên kurmancan
yên bi sera bermekîyan kurmanc bi nav
dikin. Yek ji wan Dr. Ebdulmecît Şexo
ye. Ew di lêkolîna xwe ya ku me qalkirî
da bermekîyan wekî malbat / qebîleye-
ke kurmanc dide nasîn.

Ji bo piştrastkirina vê delîlên din jî
hene. Xwendevanên kovara Bîrnebûnê
jî dizanin, ji eşîra xelikan wekî ku min
li jor jî qal kiriye komeke ne piçûk li
nava Anatolîyê dijine. Nifusa xelikan li
vê herêmê tevhev 15 hezar e û ew li sê
qesaba û çend gundên bi wan va gire-
dayî bi cî û war in. Qesaba û gundên
xelikan yên li vê herêmê bi ser qezayên
bajarê Konyayê, Cihanbeyli û Kuluyê
va ne. Ji qesabayên xelikan ya mezintir
Xelikana Jêrî ye. Ji qebîleyên mezin yên

qesabaya Xelikana Jêrî yek jî bermekîy-
an e (Qebîleyên Xelikan: [www.xelikê-
dondurme.com](http://www.xelikê-
dondurme.com), beşa dîrok). Bi helda-
na nivîskarê Bîrnebûnê û edîtorê mal-
pera xelkedondurme, Ûskê Cimik li
Xelikana Jêrî nêzîkî 100 mal bermekîy-
anî ye. Bi gotinke din li xelikana Jêrî ji
her 7 yan 8 meriya yek bermekîyanî ye.
Bermekîyên vira xwe xelikanî dihesibî-
nin û mîna xelikanîyên din bi kurman-
cî deng dikin.

Di hinek pelikên internetê
yên navxweyî û herêmî da jî qala
Bermekîyan tê kirin û li ser tarîx û
nasnameya wan û cih û warên ku ew
lê dijîn haydarî tèn pêşkêşkirin û li
ser van mijaran tê mineqeşekirin. Li
gorê haydarîyên di van malperan da jî
aşkere dibe ku bermekîyan kurmanc in
(li gor hinek dîtinan hinek bi kurmancî
hinek jî bi kirmancî/zazakî deng dikin)
û mal û malbatên bermekîyan li hinek
gundên doralîyên Sîverek, Maden,
Amed û Çewaxçûrê belavbûyî bi cih
û war in. (Yasînlek, Lek Koyu ve
Soyunun Tarîhî: [www.sancakkoyu.
com](http://www.sancakkoyu.
com) û Foruma Kurdên Anatolîya
Navîn: www.xelkedondurme.com).
Aşkere ye ku li gorê haydarî û
çavkanîyên ku di vê nivîsê da li ber
çavan hatine rêxistin, bermekîyan bi
eslê xwe ne faris, kurmanc in.

20.09.2008, Mainz - Elmanya

Mîrê Botan û Mîrê Badînan

Jordan

Carekê mîrê Botan û mîrê Badîna bi hev ra şer tajon. Herdu quwetan xwe bi hev anîn ji bo darbeyekî mezin. Navbera wan da şerekî giran qewimi.

Mîrê Botan leşkerên xwe rakir berda ser Badînan. Herdu leşkeran hecûme hevdu kirin. Şerekî, ya mirin ya serkeftin dest pê kir. Erd meşt bû ji laşan û xwîn rijî wek robaran.

Mîrê Botan dît ku leşkerên wî ber vî şikestinê diçê, rabû xwe paş va kişand û revî. Lê Mîrê Badîna bi dû ket ji bo hemû Botanîya qir bikin. Dema ku Mîrê Botan ev dit, sekîni: Li xwe zivirî û gazî li Mîrê Badîna kir. Go: Mîr, ji me vebe û bes e, were pê me. Namûs ew e, mirov havalê xwe bişkîne û şermê bo mîrekî wek te, xelkê şikestî bikalîne.

Dema ku Mîrê Badîna ev gotina bihîst dilê vî şikestî û emir da eskerên xwe ku bisekinin. Û rê da wan, xwe xilas kirin.

NOT: Va nivîsa jorîn min ji pirtûkê *Grammaire Kurde* girt, ji alî L'Abbé Paul BEIDAR (Keşîşê kildanî yê) hatiyê nivisandin. Ev pirtûk di sala 1925 an da li Musilê hatiyê nivisandin.

Keşîşê kildanîyan dibêje li Kurdistanê bi gelemperî sê malbatên kurdên mezin hene. Malbata Botan, Malbata Badîna, Malbata Hakarî. Malbata BOTAN ji Dîyarbekirê heta xabûrê (Siirt, Gêsirah, Mêdêyat û hw...) Malbata Badîna ji xaburê hata Îranê (Zaxo, Amediya, Dehok, Akra û hw...) Malbata Hakarî: Hemû bakûrê Kurdistanê (Şax, Colemêrg, Başkale û hw...)

Keşê keldanîyan dibêje va sê malbatan pir caran bi hevdu ra pevçûn kirine. Ew dibê, îro ji car caran di navbera wan da minekaşa dibe û pir xwîn tê rijandin.

CÎGERXWÎN

Mem Xelîkan

Cigerxwîn di sala 1903 de, gundekî girêdayîyê Merdînê li Hesarê hate dinê. Navê wî yê heq Şêxmûs e. Hê 15-16 salî wû, dê û bavê xwe bi salek navber winda dike. Li cem xwûşk û birayên xwe yên mezin dimîne. Ji wana re rênçberî û şivantîyê dike.

Malbata wî, di sala 1914 an de ji bo ku şerê cîhanê yekemîn dest pê dike, dihere Sûrîyê û li Amûd'ê bi cih dibe.

Cigerxwîn li sala 1920 an ji Sûrîyê radibe dihere Amedê. Ji bo ku biçê ber şêx û melan bixwîne. Ew xwendina 15 salî di 8 salan de, li sala 1928 an diqedîne. Dema feqîtiyê, Cigerxwîn li herçar perçên Kurdistanê digere û rewza gelê kurd, baş nas dike.

Di sala 1928 an de, dest bi nivîsandina helbestan dike. Di sala 1925 an de tev li serhildana Şêx Seîd dibe. Piştî têkçûyîna serhildana Şêx Seîd, carek din bi ronakbîr û welatparêzên kurdan ve derbasî Sûrîyê dibe. Ewana, di sala 1937 de, bi navê Xoybûn komeleyekê ava dikin.

Şêxmûs jî tevî vê komelê dibe û di kovara Hawarê de bi navê Cigerxwîn şîer di-visîne. Ew helbest li dijî zilm û zorê bûn û bi kela welatparezî tijî bûn. Bona wê, navê Cigerxwîn di demeke kurt de, li herçar perçên Kurdistanê tê bihîstin.

Di sala 1949 an de, Cigerxwîn dibe hevalê komûnîstan. Di sala 1950 de, li Kurdistana Sûrîyê Partî Demokratî Kurd ava dibe. Cigerxwîn jî dikeve vê partîyê û hetanî mirinê jî endamê wê bû. Di sala 1961 an de dema şorişa Kurdistana başûr dest pê kir derbasî wira dibe û alîkarîya serhildana, Mille Mistefa Berzanî dike. Li Akedemî ya kurdî ya Bexdayê dersên ziman û edebî dide xortên kurdan.

Dema ku Serhildana başûr têkçû, nûva vegeerî Sûrîyê. Sala 1973 an ji ber stemkârîya Sûrîyê, Cigerxwîn dihere Lûbnanê. Hetanî sala 1975 an, li wir dimîne û di-wana xwe ya sisiyan "*Kî me Ez*" li Beyrûdê çap dike.

Mamosteyê zimanê kurdî, yê mezin li hember kolonyalîstîyê wû û dostê aştîxwaza wû. Di helbesta xwe de;

*"Kî me ez?
Kurdê serfiraz
Dijminê dijmin
Dostê aşitîxwaz
Ez xwaş mirov im
Ne hirç ne hov im
Lê çi bikim bê şer
Dijmin naçî der
Bav û kalê min
Dijîn tev serbest
Naxwazim bijîm
Ta ebed bindest
Kîme ez?"*

Ew çiqas xwaş aniyê ziman.

Êşa, Kurdistanana bindest, derd û kulên netawayê kurd ew cîger bi xwîn kiri wû. Nalîna welatê wî, nalîna Kurdistanana delal, qet ji bîra wî dernediket. Derd û kulên welatê wî, li ser milên wî barekî giran wû. Di helbestên xwe de ew tînan ziman ku gelê xwe şiyar bike. Rewşa Kurdistanê bi çarîna

*"Nalînek tê gubê min, lê wînda û nihane.
Agir berda dilê min, tev bû pêt û dixan e
Barek da ser milê min lê barekî giran e
da ne serhev kulê min hemî derd û bela ne" tîna zîman.*

Helbestvanê nemir, şairê bê welat, bi xebat û helbestên xwe di demek kurt de di nav şairên dinê de cihê xwe girt û bû helbestvanekî navnetevî. Wî ne tenê bi derd û kulên kurd û Kurdistanê, bi êş û pirsgirêkên her gelekî li ser dinê re dil û serê xwe êşand û ji bo wana xebat kir. Di helbesta xwe ya bi navê "Heval Pol Robson" de digot:

*"Ey heval Robson!
Ne tenê reşik ketin bindestan
Em jî spî ne mane perîşan
Reben, belengaz, bindest çarereş
Birçî û tazî tev jar û nexwaş
Gunê me çi ye ne sûc ne sebeb*

Ketin bin destan ev kurd û ereb
Zencî û hindî em hemî însan
Kê em hiştine wisa perîşan
Nizam nizam...”

Û bi ronakbîri û helbestvanîya xwe ya navnetewî, xwe da nasandin.

Cigerxwîn, jîyanek bi rûmet jîya. Meriv dikare bêje, qet tu pîrsgirêkên li ser dinê û pîrsgirêkên kurd û Kurdistanê wî li ser helbest nenivîsandî tunen. Di helbestên xwe de, tim û tim dixwast gelê xwe şîyar bike. Hîs û fikirên xwe, bi zîmanê kurdî wiqas xweş tînan zîman ku zîmanê kurdî ji nû va diafirand. Li hember axa û bega, li hember olperesta gelê xwe bi helbestên xwe dixwast şîyar bike. Ji bo wê digot;

”Şêx ne dilxwazê te ye lê rênçberê navê xwe ye”

Dîsa:

”Ew bi xwe parsê dike kêngê xwedê gotiye”

Cigerxwîn li hember axa û began jî xebat kir. Wî dizanî ji wana tu xêr nayê gelê wî û welatê wî, yê wek keçikek zend bi bazing.

Dexwazê wî;

”Di nav me de, ne beg mayî,

Ne axa ye, ne paşa ye.

Xwedî kar û xebat wûn”

digot;

”Çilo win dibêjin ”Belê ez xulam”

Wilo ew dibêjin li nik qeymeqam

Bes e zû şîyar be tu guh mede began

Metirse ji dengê teba û segan”

Cigerxwîn di jîyana xwe de bo kurd û Kurdistanê bêwestan şuxulî. Ew, ewled û helbestvan û zîmanzanekî gelê xwe yî hêja ye. Lê kurd û Kurdistanê ji gelek qedra wî zanî û ji heslbestên wî hunermendên kurdan gelek sitran çêkirin û gelê kurd hê guhdarê wana ye û bi wana şa ye.

Mamosteyê mezin, di jîyana xwe de wekhevî ya jin û mêran yek dizanî. Ew fikira xwe di helbestan xwe ya li ser seroka sedleşkerên Kurdistanê Başûr, Leyla Qasim

”Şêr şêr e, mêr e yan jin e

Nîşan bi dest, Leyla min e

Polayê dil wek hesin e

Leyla kî ye

Leyla jin e

Leyla min e

Leyla min e” anî bû ziman. Ewledê kurd û Kurdistanê yê mezin, yê nemir, mamosteyê zimanê kurdî yê hêja, helbestvanê navnetevî û bêwelat, di jiyana xwe de gelek xebatên giranbiha dan. Di helbesta xwe ya bi navê ”De bigere li ser tac û sera”

de bi rêzên;

”Ey dil li qiraxa çemê Amed rûne sergerdan

Rind çavên xwe veke temaşe ke welatê kurdan

Li alîkî tac û teylesan bêxwedî ne

Li alîkî kalosên kevej ketine bin lingan

Ji berîka xwe desmalekê derxe û çavên xwe paqij ke,

ji wan hêstirên xwe wek tav û baran” rewşa Kurdistanê anî berçavan.

Cigerxwîn li her pêvajoyek jîyanê hebû. Di şer de, li aşitîyê li cemi kedkeran, di hîs û ramanên jîyanê de li evînê jî hewû. Ji yarek delal re digot;

”Wextê seher rabit ji xew, biskan li ser dêman veke

Neynik li ser masa sedef zilf û gire bendan şeke

Çente bi dest te spî zêrbazinan ceng û şer in.

Dakev ji nav Birca Belek nazdariya dîsa meke”

Hosteyê bêmirin, di sala 1979 an de derbasî Swêdê bû jîyan û berxwedana xwe ya dawî li Stockholmê domand. Dema hatî Stockholmê 76 salî wû û berhemên xwe yê dawî yê li wir çap kirin.

Berhemên wî:

Helbest:

- Dîwana yekem: *Prîsk û Pêti* 1945 Şam
- Dîwana diwem: *Sewra Azadî* 1954 Şam
- Dîwana sêyem: *Kî me Ez* 1973 Bêyrûd
- Dîwana çarem: *Ronak* 1980 Stockholm
- Dîwana pêncem: *Zend-Avesta* 1981 Stockholm
- Dîwana şeşem: *Şefeq* 1982 Stockholm
- Dîwana heftem: *Hêvî* 1982 Stockholm

Berhemên wî yên ji bo çand û zimên;

– *Destûra zîmanê Kurdî* 1961 Bexda

– *Ferheng, perçe yekem*: 1962 Bexda

– *Ferheng, perçe duwem*: 1962 Bexda

– *Tarîxa Kurdistan*: (3 cild in 1985-1987 Stockholm dû mirina wî hat çap kirin)

Helbestvanê Kurd û Kurdistanê û yê nawnetevî li 81 salî ya xwe li Stockholmê, di sala 1984 an de çû ser heqîya xwe.

Digot;

*"Ax birano ez nexwaş im nexwaşê welatê xwe
Derdê min jana zirav e serxwebûn derman
Ez ê bimrim bi vê êşê her ev e dexwaza min
Tenoşeyê min çêkin ji textê ber darê zindan
Derbasta min çêkin ji darên sêpiyen Amed, hem,
Qerqerê min çêkin ji teylesan û şal û şedan
Dixwazim min bişon bi ava Dicleyê Amed, hem,
Ji ber gulavê li min bireşinin hêstirên keç û bûkan
Eger li min negerin kovar û rojname û tarix
Bila li ser min bigirîn çend Dilşah û Perişan
Maki wê nebêji sed xwezî me bi dilê Cegerxwîn
Ko ez li goristana Amedê carek bibim mêvan"*

Ev, mirovê mezin û zimanzan, helbestvanê Kurda yî navnetewî li Qamişloyê li perçekî welatê wî yî bindest li ser milên sed hezaran bin ax kirin. Xwedê rehma xwe lêke!

Çavkanî:

Dîvanên Cigerxwîn û pêşgotinên wana

Wîkîpedîa Kurd

Antolîjî ya Edebîyata Kurdî (Cilt-1 Mehmed Uzun)

Mezelê Susizê



Dîmenek ji dešta Susizê, kevir û kêlên Mezelê Susizê

Ev navçeyê di vê dîmenê de "Susizê" ye. Xelkên navçe welê bi nav dikin. "Susiz" bi tirkî tê maneya "bêav". Navçeyekî bê av e. Û ev kevir û kêlên di wêne de jî mezelek e. "Mezelê Susizê" dibêjinê, li ser devê rêya gundê Hecîlera û gundê Kelhesen e.

Dema ku meriv ji gundê Hecîlera ber bi jor, ber bi gundê Kelhesen bi erebê bi qasî 6 kîlometreyan biçe, li ser destê çepê, bi gotineke din li aliyê rojava mezelekî kevn û kevn heye. Heta nuha jî kesek baş pê nizane ka ev Mezelê Susizê ji kîjan demê maye, an jî ji kîjan milletî însan di vî mezêlê de çal bûne. Anuha li rojavayê bakurê vî Mezelê Susizê yayleyê Hecîelî û li rojhilatê başûrê wê jî yayleyê Qiçiqirix heye. Ji Mezelê Susizê heta gundê Kelhesen jî bi qasî 8 kîlometreyan rê heye. Balkêşîya mezelan yek jî jê ew e ku berê wan ne ber bi qibleyê ve ne.

Ji bo ku ji rojan rojekê ev Mezelê tarîxî nebe erdekî çandinî û wenda nebe, me xwest em krokîyeke vî Mezelê Susizê bi çend rêza be jî di **Birnebûnê** de bikin mîniyatorê dokumenteke cografîk. (Red.)

Li ser cemedê jîyanek

Uskê Cimik

Pîrhevo

Mêvanên Agolê yek bi yek ji malê derketin, dev dan rê û diçûn malên xwe. Hîv li ewro wek gokekê bû, dema ku di televîzyonê de ‘Gune bakiş’ derdiket û raprapên eskeran ku yên li ber bîrdarîya gorê (anîtkabîr) xuya dibû digotin ‘êdî nîvê şeve bû’.

Estrîkên li rû ewro çav ji hevdû re qir dikirin. Li rû ewro vîkavîk yên kenî kurikan bû. Agolê serê xwe di taqî paş malê re derxist û bang kir, ‘bi vî çexex mekin vîkêvîk, ew çi mîzkirina we bû, zû werin’. Bangkirina wê kenî wan birrand. Rû ewro mina çarşevêkê şîn bû, tê de moriyên sorik vêdiketin û vedimirîn, destên kurikan di nav estîrkan de dilîstin, yekê digot ‘min girt’ yekî digot min ‘berda.’ Kenî yên wan bêdengî û dîzî di nav estîrkan de pêl pêl belav dibû.

Agolê şerpîya kesikî û bi xîzên zerîkî ê ku li ser dergûşê nixûmandî helanbû, zêrî ku li porî enîya wî ve bi ronîya

lembê endîrikê dibiriqî. Adet bû, ger dergûş lawîk be zêrek porî enîyê ve dikirin. Ev zêrî li enîya wî ûda xwengî Agolê Gula Hesê bû. Agolê, du sê perça ji nanî hûr û hişk da ser balgîya dergûşê, paşê ji paşila xwe destmalekê pêçandî derxist, ew jev kir û lê mez kir, di destmalê de deh penzdeh derzî yên dûrinê hebûn û paşê şûn da ew pêçand û kir bin balgîya dergûşê, ev tişt gî dergûşê ji pîrîkan (Pîrhevok) diparizîne. Agolê nûskeki bi sê qoşeyî û reş jî bi nîkekê ve bi hêlike ve pêda kiribû. Hîn li ser wan jî, Agolê kirasê junîyê Fet Rişîkê jî peyda kiribû.

Ew kirasê junîya li gund bi navûdeng û him jî pirozî bû. Her kî kê dergûşa xwe dianî rû dunê diçûn derpêyê junîya Fet Rişîkê dianîn. Gundîyan digot, ‘Zivistan bûye, li derva bilindbûna berfê ji bejna xanîyan bostek derbas bûye, li paş malan hewthewta kuçîkan, hîrhîra hespan, zirzira keran bûye. Li

malê Fetê Rişikê kesek tune bûye, wê dergûşa xwe yî deh royî dimijandiyê, wê ane, ji nîşka ve keçîka xwe yê mezin ketîye hundir û jê re gotiye, “Etika delalê! ka bide dergûşê, ez wê ji te re bimijinîm” û bi vê re jî dest avêtiye dergûşa di hembêzî wê de. Fetê Rişik jîneke bê-tirs bûye, bi xwe bi xwe gotiye, “va ne keçîka min e, keçîka min li vê zivistanê bi tenê nekeve rê.” Pê ve ew rabûye ser nîngan, wek bûye bayek û xwe avêtiye ser pîrîkê, ew dayîye ber lapên xwe û êpî li wê xistiye, por û dev û lêvên wê ruçkandine û di xwînê de hîştîye, paşê ji nîşka ve pîrîk bûye parîyek nan û ji ber çavan com (wendabûn) bûye, ji wê rokê pê ve pîrîk li mala wan tû caran xuy nebûye.’

Agolê ew kirasê juniya qet ji xwe nedikir û digot, ‘ew li ser min genî û germal bibe jî heta çel royan ez wê ji xwe nekim.’

Çel royên din şûn de êdî pîrîk neye ser dergûşan, ew bawerîya gundîyan bû.

Agolê serê xwe ber ve dergûşê dirêj kir, ew bîhn kir û maçek da enîya wî, pê re jî dergûş venciqî, Agolê got, ‘wee?! ez li dorê! tirsîya?!’ Paşê wê dest dirêj dîwêr kir û lambe ji çirê derxist, ‘hu’ kir hundirî lambê, dûva du sê ca-

ran li der dorên wê jî tû kir û piştê kî-tana li ser serê xwe derxist û pê ew paqij kir. Fîtila çirê bi kîbrîtê vexist û lambe da şûnê û xwest ku ber ve taqê here ku careke din bangê kurikan bike, di wê radêyê de li neynika li kêlekî lambê çirê xwe dîyîbû û di cî de sekinî û li xwe mez kir. Ew ji neynikê bostek û ji xwe jî du bost dûr xuy dikir.

Ew hîn neketîbû çelî lê sipîtî di nav porên wê de cî girtîbû. Porê xwe yî bi guliyên hûr hûr li ser mîlên xwe berdayî yek bi yek ketibûn rêze, di nav berê her guliyên de morî mircan li hev giredayî bû. Tîliyên wê li ser guliyên re dihat û diçû. Serê wê li ser milekî xwe xahr bû, perçem li hêleke şikestîbû û çavê rastê pê hatîbû girtin. Li ser rûyê wê ne bextewarîyek û ne jî xemek hebû. Nefesek dirêj, sivik û kûr kişand û hedî hedî berda, keser di neynikê de diçû xahrê. Li kêlekî neynikê çekêtekî qehveyî hebû, ew ê mêrî wê bû. Agolê ew her şîva li ser dergûşê dinixumand. Destî xwe li ser wê du sê caran gerand. Mêrî Agolê nêzikî pênc sal in, li welatê Alaman bû, yên ji xeribîyê dihatin û digotin, ‘Me mêrê te li Firansê dîye, henan jî digot li Welatê Swêdê me dîye.’ Mêrî wê du salan an jî pênc salan cike dihat gund û ew mehekê dima

an jî nedima. A herî dijwar jî ewê ku henan digotin, 'Mêrî te li wir zewicîye.' Wî bo aboriyê malê ne qeymek û ne jî nameyek ji malê re dişand. Agolê bigota, 'Ha mêro! te hetê vê çexê bo malê tû tişt nekîr, te ji me re va qutîya şand û te pê gundek li ser serê min civand.' Agolê ji vê televîzyonê re digot 'qutî'. Agol bo aboriya malê her roj biçûya malan dûrinî bikira, tevn bikira, nan lêbixistîya û li ser çem bi ro bê ro kinc bişûsta. Pê vê cîwanîya xwe, pişt lê xûz bû.

Agolê serê xwe berve çêket dirêj kir, xwast ku bîhn ke, bi qirç qirça dengê derî Agol vencişkî û wekî brûskeke serê xwe berve derî çerx kir û vê re jî guliyên wê li hewa berhev ketin û morî mircan deng dan. Herdû keçikên xwe û ez, em ketin hundir. Agolê bi dengê zîz û bi hirs got, 'ma mîz kirina we serê we bixwe! zû têkevin nivînên xwe û rakevin!'

Hîn dergûşa Agolê nehatibû dunê wê ji etika min re gotîbû, "Nurê! he-te çel rojan ma va gûhvîtko li cem me be, çir dibe çir nabe, dibe ku pîrîk tê!" Hete çel rojan ez li mala Agolê bûm, digotin 'li malekê mêrek bibe pîrîk nayê wê malê.' Min di van çel rojan de bi van çavên xwe pîrîk nedîbû,

min va ji xwe re kar dixisand û pê ve di nav gund de serê min bilind dibû. Lê her sibe Agolê radibû, ji cîranan re îşev çend pîrîk hatin û çûne bi çoşeke mezin qal dikir. Wexta ku Agolê wisa digot, min serê xwe dikir ber xwe û ji fedîya re heft caran diketim binê erdê. Yek caran jî di goşekî kirasê junîyê xwe re digirt û digot 'va kirasê junîya li ser min tûne bûya pîrîk ê em îşev bixwarîya.' Ez î xizan! Vi çend kirasê junîya jî tûnebûm.

Agolê niçika pîrîsa endîrkê a li kêlekî derî tilî lê da û lamba endîrkê hat vemirandin û hundirê odê ket bin ronahîya lamba çîrê.

Li kolanên tarî, dirêj û teng ne mîrovek ne jî heyvanek hebû. Li paş mala Agolê, li ser kûlingê (arî) bablîsokek biçûk rabû, li ber hev xwe da, li der dorên xwe zivirî û paşê zîrav bû û li hewa xwe bilind kir. Bayekî sivik di taqê Mala Agolê re xwe avêt hundir, tûlperdeya pencerê hejand. Destekî çaketî ê li ser hêlika dergûşê giran giran heyne. Paşê bi vebûna deriyê odê televîzyon ve helhelek jî di hundir de belav bû û vê re jî bi qirçgir-ça dengê derî ve pisika malê xwe rast kir û bi çavên xwe yê biriqî li derî mez dikir. Hundirê odê niv tarî bû, pêti

yên lamba çirê ê bi diwêr de bi mîxekî kutayîbûyî li ser yêr radiketî re dihat û diçû.

Qeratîyek bi lezûbez ber xanîyê Agolê re derbas bû, minak tu bêjî ew bi dîwêr de xuj dibû, ne tu dizanî ew mêr bû, ne jin û ne jî heywanek bû. Qeratî di goşê malê re çerx bû û ew di nav şevêreşê de com bû.

Dîregî endîrkê li ber malê Agolê bû, ronîya xwe dida xanî. Li ser xanî, bi panîyê wê neyloneki çend derên xwe yî dirî rexistîbû, li her kenarên wê jî kevirên biçûk avitine ser ku ma ew li ber ba nekeve. Lod lod xulî jî avitine ser neylon ku ma li berf û baranê odeyên xanî dilop nekin. Lê dîsa jî her zivistanê her odekê dilop dikir, Agolê êdî legan, teboxên xwarinê, sênî dikirin bin dilopên baranê. Car carnan jî Agol an jî çend kurikan yêr cîranan e helkiştina ser banê bi bêran an jî bi şîşingên (gêzî) berf li ser diavêtin. Dengê şîşîpên dilopan xewek nedida yêr malê.

Di bin qamişên sêz yêr rexistî de, serê yêr darên qalind yêr geliştî hen dirêj bûn, hen jî di nav qamiş û kerpîçan de bi zorî xuy dikirin. Di navberê her darekê de nêzikî bostek hebû, di bin her darê de jî hêlînên

çûkan û dûmeqeskan lê hebûn.

Li diwêr, ji jor de heta dawîyê qelişîyek lê hebû, ew mîna birînekê kur lê xuy dikir. Çend rojên ber ve, çend xortên gund li diwêr bi kîrêça sîpî 'Bijî Kurdîstan' nivîsandibûn. Qeliştî ew nivîsa bi du alîya kirîbû; Bijî kurd û îstan.

Bi hatina ba û bi barîna barane ve xulî li derdorên keviran yêr temelê xanî dicivî, bo ve xaniyê Agolê her sal bostek di erdê re diçû xahrê.

Qeratîya bêdeng û bêreç di nav şevêreşê de derket, ew ber ve derî yê xanî çû û ew ket hundirî malê. Sîha wê li diwarî odeyê Agol raketî de xuy bû, piyên wê ji xwe dirêj bûn, porê li serê wê mîna şîşingên sêz lê çik bûn. Ew piçekî li ber hêlikê dawestîya û dûva wê du sê caran hêlik hêjand.

Agol di xeweke kûr da bû, porê xwe yê reş û spî li ser balîva serî gij bû. Ronîyê lamba çirê hêleke rûyê wê sor dikir, hêla din jî di şevêreşê de bû. Kirasekî şînî lê bû, ber stûka wê bi çar morîyan bû, her çar jî lê girêdayîbû. Agolê di ber xwe de giran giran dikir pilêpil û kanikên çavên wê lê dilistin. Sîyek li ser Agolê xoy bû, destekê du-sê caran hute piyê Agolê kir, Agolê çavên xwe vekir, ew çi bibîne!!!

Agolê xwe rast kir û bi dengêkirî şaşmayî ji wê re got, 'Weee Xûngê! ez bi qurban! Tu bi vê çaxê hatî vir çil? Gula Hesê li ser Agolê xwe xahr kirîbû, bi dengê nerm û hêdî jê re got, 'Gotin derguşa xungê te bûye, Ez li dorê! min go, ez ji te re ûdekê binîm, loma ez bi vê çaxa ketim rê.' Dûra jî wê dest avit paşîla xwe, topek derzî jê derxist û bi lez avêt nav hêlikê û qîjinî bi dergûşê ket.

Agolê çav lê bel bûn, benz lê zer bû. Ew mîna brûskêkê rabû û xwe avêt ser wê û bi porê wê girt û ew da ber xwe, por lê diruçekand, porê wê mîna jûjîyê bû, jê bi tele bi tele divaştî û çar didanên dirêj û tûj di dev de dibiriqîn. Di herdû bêvilên wê re marên biçûk û reş derdiketin, wan xwe li Agolê dipêçandin. Ji pêşîrên li ser mîlên wê xwîn dilop dikir.

Agolê di nav nivînan de xwe diçirpî-nand, di xwû de reş bû, di ber xwe de dikir wexêwex, serî li xwe pît pît dihêjand.

Bi wexêwexê ez rabûm ser nîngan, bi ronahîya berbangê hundir vekirî bûbû, keçîka xwe biçûk li kelekê nî-

vinê Agolê bû, çeketê bavê xwe lê bû, pê xof xuy dikir, ez jê tirsiyam. Keçîkê ez dîm û vê re jî meşîya, hat cem min, ew dilerizî. Dest û piyên Agolê li hewa dilîstin, êdî wê bi dengêkirî bilind dikir wexawex. Keçîka xwe din jî ji xwe rabû, me her sêyan xwe li hevdû pêçand. Em ji tirsan jî çokan ketin, di cide em rûnîştin.

Ne ji Agolê, ne ji dergûşê û ne jî ji me dengê derdiket. Bêdengî mîna xofekê di odê de çerx dibû. Pêçêke din şûn de ez rabûm, bi min re her dû keçîk jî rabûn û xwe li min pêçandin. Min lamba endirîkê vexist û em çî bibinîn!!! Hêlik vala bû, Agolê li ser nivînên xwe yên gîj bû û ew bi çokan ketibû erdê, serê xwe li erdê bû û li ser nivînên wê zêrê dergûşê dibirigî.

Berbang bû, roj hema hema li derketinê bû. Hestirka sibê li jor Gomê Hecê Qomê xwe dilivand. Ji dûr de, dengê fîrîskên şivanan, yên pez û yên kûçikan li ber hev didan. Ji hêla gund de jî dengê Serkan mîna qemçiyekê li ser ga diket. Naxir di nav toz û dumên de li ser pîra Hesênê Qedê re derbas dibû.

bakî hênik hênik
pêl û pêl tê
avên kişîyane
gogircîyê xuya nekir
sîyên darên bî daketîye ser çêm
masîyekî li nav avê li hêlina xwe digere
fîratî zelal û zelal diherike
kepirike avê ê konî xwe dadigirê
ez î li keviya fîrat im
serê min î li ber rojê
lingên min î di nav ava şîrgerm da ne
ez ji qedehî vala î li ser masê hez nekim
sîdurî
tu li ku mayî
berde ma here
ma jîyanê dewlemend
bersivên zêde bike
wa janan ancax
hêvîyeke mezin
û felsefeke kûr
sivik bike
sîdurî
derdê me jî bes ne awê
tiştê ku tu bikî rê nîşanê wî bide
ma ew here lêbigere
lêgerîn î rind e
da ware
xwe bi kêleka min de
û ji min re qala hersê tiştan bike

seyfi dogan

QENERE

Seyfî Dogan

Hevalê min, dostê min û pixaltîyê min î delal Mem Xelikan di hejmara Bîrnebûnê ya 30î da qalê kuçikî Hesî Colo dîke. Hêkateke xwaş e. Kuçikî Hesê Colo î qenere ye.

Qenere rengdêra ku ji bo kuçikên arode û ne no re tê bi kar hanîn. Kuçikî qenere î binar e, birçî ye, çilek e, lingşewitî ye û tirsonek e. Tiştên ku ji kuçik tèn xwastinê, kuçikî nake. Ew tiştane çi ne? Şivan dixwaze ku ma kuçikê xwe yî no be. Pezî wî ji guran û dizan biparêze. Xudanê malê ji kuçik dipê ku kuçik kesên ku net û

fêlên xwe xerab in nezikê mala wan neke.

Li sîyê dûkanê Uskî Umê, kalên gund ê runiştine. Apoyê Fate Kirê, Uskê Umê, Haskê Omere, Îtkê Asê Asîyê, Mustefeyê Malê Harside, Hecîyê Tewarikê, Memkê Malê Şexikê, Alosman, Nekîmê Malê Alî Corliyê, Mehmedê Mistê, Memedê Ashê, Osmanê Malê Hêwoyê, Mehmedê Îdê, Şamliyê, Husê Zaxê Xocê, Hecê Malê Herşîdê, Eliyê Hecîyê Oxcîyê, Omê Heskûrê û Ehmedê Umê.

Apo yê Fate Kiriyî hêkatekê kat dike û ê din jî yê mat bûne û guh didine



ser. Apoyê Fate Kirê yî rehmêti, deryakî folklorê gelerî bû. Pîrê zenêatî qutsî bû. Zenêatî Hz. Musa û Hz Îbrahîm. Apo hunermendê filosofîyê Ahura Zerduşt bû. Tav! Hêyfe mêra!..

Bi imitasyonê kes di ser re tune bû. Ki dibe ma bibe, Apoyê rehmetî dikanî bi zarê bike. Apo bi xwe hêkat wek senaryokê tasavûr dikirin û ji guhdarên xwe re pêşkeş dikir. Apoyê delal, qala kuçikî xwe yî qenere dîke; Me pezi hemêle çiyê kiriyê wext dev û devê êvarê ye. Siya çiyê ê deketiyê dawîya çiyê. Ji bo wê jî dawîya çiyê hendik tarî bû.

Dema me bihar e, çêrêyî bol e û çola me şên e. Delêgurên biharê î har in.

Ez û çonê xwe, me yî xwe daye taltî zinarekî û pez î giştik ji me va xuya dîke, lê pozî çepê yî ji me tenekê dûr e. Li ber me, li ser hewanê, lokum û biskuvîten ku

me bi hiriyê ji etarî Kulekê sandî û em ê ji xwe re qala şivanên berê û hêkatên wana dikinî.

Car carna çiqas pez ji me va xay dîke jî çî dibe çî nebe, em î dor aliyê xwe mes dikinî. Min xwe li ser pîyî çepê tenekê çerx kir ku li pêz binerim. Min dît ku pezi ji pozî çepê da li aliyê başur da ne yî rehet e. Mihê sewrê ku ez herşev pîzbendê tavême sû ku ê serî xwe hildinê û guhên xwe bel dîke. Min guman kir ku li wê derê rewzê ne li cî ye. Ez rabûm û min şîva xwe ya zoxelê kire dest xwe û berve wî aliyî çûm. Kuçikê min jî kete du min. Ez nezîkî perî pêz bûm û dawestiyam. Min dît ku dêlegurê yî xwe kiriyê taldî zermasîyekê û ê bi zorê xuya dîke. Delêgurê ganê lê biçûk bûne. Ew heywana jî li risqekî xwe digere û dixwaze çêlikên xwe têr bike. Herek çêlikên xwe ne yek û ne dudu ne.

Wê salê di holikê dêlegurê da me heşt çê-
le dît. Gerek em li çîya û li deştan bi hey-
wanên bajî re tev jîyanê bêwîsînîn. Xwedê
risqê wana jî daye û ê me jî.

Gurên hertim ji hemberî bê da, di
kemînê(pusu) kevin. Wê carê jî dêlegurê
werkiribû. Heger dêlegur, ku firsatê bibî-
ne ew ê ku biberizê pêz. Kuçikê min î ku
di dû min dihatî, dema ku bihna dêlegurê
kete poz û gur dît, xwe avite paş min. Min
seriyê kuçik berve dêlegurê kir ku ma bi-
berêze gur, lê çi fêde, serê xwe kire ber xwe
û xwe avite nav lingên min. Min kir wî
kir, beriyê xwe berve gur nekir. Min jî çi
omidî jê dikire! Bi carê siftê re bakirê xwe
derxist ortê. Min ew kuçika bi du berxên
mina beranan ji şivanakî Kurçê sandibû.
Kuçikê min î din gehişte min û hicûmê
gur kir û gur di nav zinaran de winda bû
û çû. Min ew kuçika ji şivanekî Akdaxê bi
kavireki sandibû. Ez ê rast bêm omidiya
min jê pir tunebû. Çimkî yekî zincevî û
hurik bû. Lê kuçikê Akdaxê pir no der-
ket. Bi rastî min wîqas jê nedipa. Min
navê wî Dumo lédabû. Mina şêrekî bû.
Dizan piştên xwe li ber bi du aliyan bû.
Dema ku bihna Dumo diçû pozî guran,
wan heft çîya didan paş xwe. Gotina min
ew e ku kuçikê min î ku min bi çalek pe-
re sandî omidiyên min gişt li boşê derxist.
Yanê kuçikê min qenere derket.

*Zermasî ji familyayê verbascum e.
Qirarê 250 çêşidên xwe hene. Li çîyayên

Xelika zermasiya ku heye, navê xwe ver-
bascum vulcanicum e. Çimkî ew li ser axê
vulkanîk dirûze(çiyayên xelikên jorê çîy-
ayên volkanîk in). Nebatekî ji cinsî giya ye.
Di nav toxumê zermasiyê da saponîn heye.
Saponîn ji bo masîyan wek axû ye. Ji bo
nêçirê masîyan, nêçirvan goşt û toximî zer-
masiyê li hevdi têxin û wek yem tavên nav
avê. Dema ku masî wî yemî dixwin bîrve te-
rin û nêçirvanên masîyan berhev dikin.

Li gor min mana zermasiyê etîmolojik
tê manê zehîra(jahra) masî ye.

*Lingşewitî: Berê her malekê kulinge-
ke xwe habû. Çopê xwe, xuliyê zowê û ten-
durê davitine ser kulingê. Dema ku xuli-
yên zowê û tendurê davêtin, koziyên agir
jî pê re dihatin awitinê. Kuçikên ku kuling
û bi kuling ji bo xwarinê digerin, yek ca-
ran pêla koziyên ku di nav xuliyê da mayî
tenan û lingên xwe dişawîtendin. Ji bo wê
jî, ji kuçikên ku bêxwedî û arode re dibêjin
kuçikên lingşewitî.

zermasî: sığır kuyruğu

nêt: gaye

fel: hile

no: azgın, haşın

arode: boş gezen, avare

hewan: dağarcık

Ahura: bay, hazret, büyük

Çone: çobanın yardımcısı

Etar: bakkaliye eşyası satan,
gezginci satıcı

Bajî: yabani, vahşi, yırtıcı Şerê

di navbera.

Bi zaravî xelika:

ÇAV

Nuhê hecê (Nuh Ateş)

“Ronî xuyanîya digîne çêv, çav jî wana digîhîne însanan.

Guh vê deng e, devî kerr e, lê çav heytene û deng dike!”

Johann Wolfgang Goethe

Di sayê çavan da meri dibîne, dixune û tê digê. Çav xemla rindî û şuretîyê ne jî.

Xenêbûn, hêrs rawûn, êş, xem, hez, nefret û hesret bi çavan jî têne nimandin. Yanê mîna ku şayîrê alman Goethe gotîye, çav deng dikin, peyama heytenin û didin.

Çav di şîret, azar, lome, nifir, salixdanê û gotinên mezinan da jî derbas tewin. Çend nimune:

Çavê li derîya, xwelî li serîya!

Ez qurbana hêstirkên çavan!

Îşqê çava birije!

Çava bixum!

Çav lê ketin, çav li rê, çav birrîn, çavreş, çasvsor, çavbirçî, çavfereh, çavtêr, çav pê va dan, çav qirkirin, çav

gewr kirin, çavpêl...

Çav tê ra qir kirin bi mena hîşmardayîne tê gotin. Dilketîyan berê li gunda bi dizkî çav di hev ra qir dikirin û bi çavqirkirinê ji hev ra peyama dişandin.

Çav gewr kirin tê mena hêrsrawûn û azarkirinê. Kesekê ku hêrsrawûyî hêrsrawûna xe ya jî nerazîbûna xe bi çav gewr kirine nîşan dide. Berê li gunda dê û bava ku em bên li kurikê xe, hers ratewû, wana di kurikan ra çav gewr dikirin. Wana qanikê çavên xe weng vedikirin ku gewrkî çavan xay dikir.

Magî çavpêlo! Ji kesên ku emeli pê nawe û xerawî û heylazî jê tê payîn tê gotin.

Ez di hen ferhengên kurmancî da (Îzolî, Farqînî, Enstîtuya Kurdî Frense) rastî gotinên mina çavpêl, çav gewr kirin, çav qirkirin nehatim. Li derên din hene tunene nizam, lê di kurmancîya Xelika da van gotinan hene.

Şayîrên kurmanc yên ji Anatolîyê di şîêrên xe da şûn dane gotinên li ser çavan yan jî yên ku çav tê da derbas tewin. Nimune:

Mem Xelikan di şîêra xe ya bi navê “Çavşîlanê” da qala çav lê rê bûnê dike:

*Çavşîlana min
Jîyan bê te ne şêrîn e
Çavên min li rê
Dibe ku rêwîyek
Silav û sifetekî te bîne...*

Seyfi Dogan di şîêre xe ya bi navê “Çay” da qala hêstirkên çavan dike:

*Îşev
Ez dê bibim hevalê
Şehîdên azadîyê
Eger ku ez stuye xwe
Li ber gorên wan xwar bikim
Hêstirkên çavên minê
Kincên minê reş wek yek kaxizên
ku li ber rojê zîwa bûyî pêtiyê vêxin...*

Xizan Şîlan jî di şîêre xe ya bi navê “Sewdaya Ber Dilê Min” da qala awirên çavan dike:

*Sewda ya ber dilê min
Şewqa awirên çavên te
Dibiriqîn, diçirîsîn
Di çavên min yên xemgîn da...*

Di kilameke kurmancên Anatolîyê

ya bi navê “Bewrar” da qala çav lê ketinê tê kirin:

*Bewrar bewrar damekeve
Ma çavê min li bejna tê kêbar nekeve
Her ku çavê min li bejna te dikeve
Janek dikeve serê min qe dernakeve...*

Di kilamên gelerî da û di yên ku hunermendên kurmanc yên Anatolîyê distrên da jî şorên bi çav der bas tewin:

Di kilama Xelika ya bi navê “**Gula Mamê**” a ku Koma Xelika distrê da wer tê gotin:

*Destî xe oy di destî min ke
Hiv ji me ra lêlê bez-gavek e
Wan zalimna kê cêmêr e
Ma bi çavî min li tê meske ...*

Di kilama “**Avsar Kanî**” ya ku Cejno distrê da qala çavrijînê tê kirin:

*Kanî kanî avsar kanî
Bejna zirav wek siltanî
Çavên xwedîyê te birijin
Ku tu dane wî xizanî...*

Di kilama Kutuga “**Çavreş**” ya ku Murat Kuçukavci distrê da qala rinda çavreş tê kirin:

*Lê çavreşa min oyy bela serê min
Estirka çavên min oyy şeva dilê min...*

Di kilameke hêla Sarizê ya ku Mehmet Bayrak berehkirî da jî qala

çavê reş tê kirin:

*Çavê reşe reş dakine
Ê merîyan serxoş dakine
Were k`em herdu birevin
Neçê gunan af dakine...*

Dayka min a rehmetî, Fata Hecîyê
Hemê di kilama xe ya ku wê li ser
lawê xe Hemîd yê ku bi qurşûnê çavê
xe wenda kiriwûn wer tewê:

*Çavên çend in çavên çend in
Brûyên di ser ra li govend in
Pênc lawikên mine dinê hene
Li herdê Hemîdî min îzbend in...*

Şayîrê meşhur Omar Heyam di
çarîneke xe da qala horîyên çavreş
kiriye û gotiye:

*Li cenetê horî hewûne, çavreş;
Meya xaştir jî li wira wûye.
Qe qalê meke, em ê zû va da li
cenetê wûne:
Mêz ke, li hêlekê yar, li hêla din
şerew...*

Li ser çavan û dîyînê mi hekatek
veng bihîstiwû:

Li dohleke xort diketine rû Gêncê.
Gêncê yekî kal wûye. Di guna wî ra ze-
wac bi destî dê û bava û mezinê qebîlê

tewûne. Berzewacan di ber zewacê ji
xêyrî carkê-ducara çûyîna dergîstîyê
hevdu netedîne, xe ji ber hev û xasî
û xezuran vedişartine. Yên ku ji yada
dizewicîne heta şeva gêrdegê hev du qe
netedîne.

Gêncê jî yek ji wana wûye, yane
ji yada zewicîye. Lê dîsa jî ew î bi tale
wûye, wî di ber dergîstî û zewacê jina
xe, Seyran carekê bi şev dîye. Ew çûye
dohleke li gundî wê. Li ber malê dohlê
Seyran di ber ra derbas bûye.

Xortekî gotiye, “Gêncê, malneketo
çing te bi carekê dîyînê, ew ji dûredûr
va Seyran bir û dile te kete wê?!”

Gêncê di bin da nemaye cewab
dayîye û wer gotiye:

“Heşê we nagênê. Erê min Seyran
di ber zewacê carke tenê dî, lê bi çavê
hîngê. Hûn dizanin çavên hîngê çing
wûn? Ew ê mîna durbînê wûn, bi şev
jî tedîn. Min şivanti kiriye. Şivana bi
şev rind tedîn. Me pez bi şev li çiya
û banîyan diçêrand, dikişanda fêzê û
şevîn dikir. Me kevir kuçikên li ber ni-
gan, gur û dizên çolan tedîn...”

Hêyfa çavên hîngê! Ku te bi wana bi
şev li jinekê mêz dikir, te xarî û xetên
bedenê wê tedîn!...”

"PANZDE SALÎ BÛM ÇÛM SER HEWÎYÊ"

Altun Başaran

"Şêr şêr e, çi jin e çi mêr e."

Ev gotin di nava me kurdan de biyê metelokeye bi nav û deng û em serê xwe pê bilind dikin. Ji ber ku ev gotin dide diyarkirin ku em çiqasî bi qedrê jinê dikin û qedrê wan dizanin. Lê li ba me û li gelek deverên Kurdistanê tiştêkî din, derdekî din ji heye. HEWÎ. Derdê hewiyê tenê jin pê dizanin. Ev sobbeta jêrîn, nivîskara me Altun Başaranê bi du xanimên kurd re kiriye.

(Red.)

– Rojek ji rojên payîzê, li kêlaka malê bi jina birayê xwe va, li ber beroj rûniştibûm. Ji jêlda birayê min bi du mêran va hatin mala me. Navê birayê min Ded bû. Dedê got; Xecê wera vir, nîvanên me ji Omera hatine, îkramê wan bikin jê ra xwarin û vexwarinê çêkin. Ez bawer im, ew ji bo meta El hatine.

Meta El bî bû, mêrê wê nû miribû. Li hemêza wê dargûşka yekesalî hebû. Min bi jinbira xwe Efê va, me îzet û îkramê wan kir. Ez ketim rû meta El, min got; xazginciyê te hatine, lê kêfa mata El nehat. Doran dina re (royê) me taştiya sibê da ber nîvanan, Dedê sifre berev kir got; Xecê wera vir, gotineka min ji te ra heye. Ez çûm ber dawastîm ka bêje; tu çi dixazi? Dedê got; min tu dayî mêr. Ez mat bûm, dawestîm. Ka te got; ji bo meta El hatine?

– Erê, lê min tu xapandî, ji bo kî ew te bibîne. Ew mezin e, erê, lê zarê wî çênebûne. Tu ê herî ser hewiyê!

– Ser hewiyê! Ez hîn panzdesalî me!

– Çi bikim, rûniştim û girîyam. Waxtak ez şeş salî bûm bavê min mir, em sê bira û du keçik bûn. Ez ya biçûk bûm. Dûra diya min çû mêrekî xwe kir. Ez li ba Dedê û Efê mam. Digrîme, tiştêkî ez bikim tune. Tenê digrîme. Bi va hestirna min çavên xwe di 25 salîya xwe de kûr kirin.

Erê.., li piştî çend rojan ez siwar kirim. Hewîya min, Fata Dewrêş bi berbiyên min va hatin Altîlera. Wê êvarê, li gundê me man. Dora dina rê fistankî qedîfeyî sor li min kirin, destên min hena kirin, gulîyên min hûr hûr hûnan, kaseyeka kesk û sor di navberiya gulîyan ra derbas kirin, biskê min birîn.



Mala Şêxê. Her tişt bi min xerib hat. Digrîme! Êvar bû, Şêx bi xoce va hatin, nika me xwandin! Hewîya min, Fatê oda me xemilandibû yataxa min û Şêxê hazir kiribû. Got bi xatirê te! Va ez terime mala birê xwe Abtila, îşev ez ê li wir bimînim.

Fatê te çima hewî qebûl kir?

Ji bo ku kurikên me nedibûn. Lê min ê çî bikira, qeder e!

Ne hêsan e, meriv mêrkî xwe bide yeka din.

Min ji Fatê pirs kir: çing bû?

– Ez çûm mala birayê xwe, jina birayê min û Abtila xwe ji min ra kuştin. Lê li ber dilê min negirt! Xew nekete çavên min, heta sibê. Sibê rawûm hatim mal. Zor bû! Lê mala Xwedê ava be, îro çar lawikên me û du keçkên me hene. Ez nê pişman im. Em wekî du xuşka ne! Em deqekê bê hev nabin. Şêx mir em bi hev ra ne, zarên me qîmeta me wekî hev dizanin. Lê derdî hewîyê derdekî giran e. Nê kişandinî!

Kofîyek dan serê min. Pişteka terebusê avêtin ser çavên min. Pişt î bi şiv şivî bû, rengên wê kesk, sur, zer û spî bû. Ji sê teja hatibû çêkirin. Ev tejana mişamki dûrûbûn. Qul qulkî bûn. Di van qulana ra min ber xwe didit. Ez heldam ser erebê, bi berbîya va hatim Omera,



ZIMANÊN KOLONÎYALÎ HÎN FERMÎ NE

Efrîkayî li berxwe bidin ku zimanên herêmî bèn pejirandin

Werger: Nuh Ateş

Bikaranîna zimanên ji hev cihê li rojêjyana efrîkanîyan têsîr dikin. Erê, lê li piranîya welatên kontîmenta reş di jîyana fermî da zimanên kolonîyalî bi hukim in.

Serxwebûna dewletên efrîkayî di salên 50 û 60î yên sedsala rabirdî da tu guhertin di serîkişandina zimanên ewropî li ser erdê kontîmenta efrîkayê çênekiriye. Îro jî zimanên hêzên kolonîyali pir caran zimanê hevpar yê welatên efrîkayê ne. Her çiqas 800 û 900 milyon efrîkî bi 2000 zimanan deng dikin jî, li piranîya welatên efrîkî zimanên fermî inglîzî û frensî yan jî portegîzî ye.

Zimanên bo cihên xas

Di jîyana rojane da meriv zimanên ji hev cihê yên herêmî bi kar tîne. Ew bi dapîra xwe va, bi merivekî li ser meqamekî resmî va yan jî li bazarê bi zimanên ji hev cihê deng dike û zimanê xwe li gorê wê diguhere. Zaneyê zimên Kofi Yakpo daxwaz dike ku êdî va rastîya li ber çavan bê girtin. Ji ber ku demokrasî û ziman bi hev va girêdayî ne. Eger tenê zimanên kolonîyalî

bên bikaranîn, hîngê piranîya civatê bi rastî nikane xwedîpar bibe. "pêwîst e ku zimanên efrîkî bibin xwedîyê rûmeta ku ew revayî wê ne" wer daxwaz dike Yakpo. Ew, sîyaseta ziman ya ku bi destê dewletê bê meşandin baş nabîne. Di berî giştan gerek e ku wezîfeya civata efrîkî bixwe be zimanê xwe ji qada xasitî derxe ya rayagîştî, mînak bi rêya bernameyên radyo yên herêmî û bi rêya wergerandina kîtaban û weşandina kovaran.

Kolyang Dîna Taîwe jî vê dike. Bi hendik pere lê bi berxwedaneke pir dozentê înfometîkê ji heft salan vir da kovara "Kaarang" derdixe. Di wê da helbest, meqale û heqat (kurteçêrok) bi zimanê tpurî tèn weşandin. Tpurî zimanê dapîra wî ye, yê ku ji bakurê Kamerûnê ye. Mîna pir zimanên din yên efrîkî jî tenê di forma dengkirinê da hene. Kolyang Taîwe xwaztîye ku vê biguhere. Çunkî ew, bi vekirina derîyê zimên bi rêya tekstê bawer dike. "Ev dîmenzîyoneke din dide zimanê dengkirinê, yê ku devê şorê ye, ji dengkirinê şûn da wenda dibe."

Bi tpuří kilamên şivanan

Kolyan Taíwe yê ku li zanîngeha Bremenê (Elmanya) demeke dirêj mamostetîya înfórmetîkê kiriye û li Kamerûnê li zanîngeha Ngaoundere beşa înfórmetîkê vekiriye, kilamên şivan û gundîyan nivîsîne. Wî gotiye ku ji însana ra pir bi mene ye, ji ber ku ji nişka va qedreke nû û nedîtî li zimanê wan mahr dibe. Va jî ne tenê sewa nasnameyê mihum e, wekî vê ji bo berxwedana sîyasî jî. Kîngê ku zimanek di qada raya gîştî da qebûl bibe, hîngê meriv dikane xwaztekên din ji ji hukumetê bixwaze.

Kolyang Taíwe hez dike ku kîtab jî û rehberê dezgehên teknîkî jî bi zimanên herêmî bîn wergerandin. Ku nebû, piranîyeke mezin ya civatê dê ji zanîn û pêşveçûyîyên teknîkî bêpar bimê.

Bê înglîzî bê tale

Bi ya zimanzan Kofi Yakpo her zimanek ayreten rûmet û tesewurên xwe yên

sîyasî belav dike, derbasî nîfşên nû dike. Bi dîtîna wî, zanîna li ser ziman û îdentîta xwe dikane bigêhîne hevfehmkirina naxweyî. Ew wer dibêje:

"Ev mijar û meydanake pîrserîyî ye û bi ya min tenê ziman bi serî xwe nikane li ser ziyan û kêrîyên ji alîyên aborî û sîstemên sîyasî yan jî li ser tiştên din biryardar bibe. Lê belê faktorekî muhim e ku meriv li ser sîyaseta zimên bifikre: Ma ew çî sistemeke demokratîk e ku meriv tê da tenê bi rêya îngilîzîzanîyê bikane bikeve parlemantoyê?"

Kofi Yakpo ne di wê bawerîyê da ye ku zimanên ewropî bitûn bîn rakirin. Pirtir ew rûhevbûneke wekhevî ya zimanên efrîkî û ewropî favorîze dike. Lê weng xuya dike ku bidestxistina vê hedefê ne hêsan e, ji ber ku piranîya elîta efrîkîyan zimanên kolonîyalî çê û yên efrîkî neçê dizanin.

DW

Jêrenot: Va nivîsa di kovara "DAMÎT" (hejmar 1 / 2, 2008) ya ku bi zimanê elmanî dertê hatiye weşandin. Nuh Ateş wegerandîye kurmancî.

ŞEVEREŞÊN SÊWÎ

ez

hinavên helbesta kal û pîr

bi şhweta hestên peritî

dadigirim û dinivîsim

li tenetiya şevereşên sêwî

şefaqên ciwaniya min

desteserî bûn

ava kaniya temenê wêran

ber bi rawestgeha

goristana lal ve

diherike

wizîna bayê mirina bêveger

di guhên giyanê min de

dîsa çinge çinge

asîman

li dor keser û nalîna min

dizivire

bêhna bîranînên şad

di xwîna çarenûsa genî de

dixeniqe

bi gavên şemitok û westiyayî

ber bi pêşeroja nediyar ve

dimeşim

li henasa roniya beyanan

bi dengê qeqeba kewan re

lêvên dilê zîzbûyî

dikenînim

ji kovaniya demsalên xwe

bafiroka bêrikirinên zaroktiyê

difirînim

li xewna şevên spî
rengê tariya rojên bihurî
bi keskesora hêviyan
dixemilînim
li hawara demên reben
sînorên rûreşiyê
ji gerdûna êşa dilê xwe
dişeqînim
li perestgeha çol û beyaran
rêya diçe fazîletê
diramim
di arşîva heyaman de
rûyê rûpelên qurmiçî
ji toza înkara dîrokê
dadiweşînim
û mirovahiyê vedixwînim
nav xezîna nefsbîçûkiya dilê xwe
ez
bi çira awirên tefandî
bi ramanên dil û kezebê
bi dest û piyên ker û lal
û
bi lerza tiliyên bedenê kor
kulîlka xeyalên çilmisî
ji nû ve
dibişkivînim

Xizan Şilan

2008-01-13

Stockholm

Çarmêxa Îsa

Lo vî dilî li min çi kir
Cîgera min li min qul kir
Vî dilî mala min xeraw kir
Bavo dîsa dayê dîsa

Bavo dîsa dayê dîsa
Werin sêri dilî min dîsa
Bavo dîsa dayê dîsa
Ketim nav çarmêxa Îsa

Te dî te dî rindam te dî
Ruberîta bela xwe dî
Ev çi dilî min î te wu
Ji vî dilî ra min çarek nedî

Bavo dîsa dayê dîsa
Werin sêri dilî min dîsa
Bavo dîsa dayê dîsa
Ketim nav çarmêxa Îsa

Dilo dilo dilo ez mirim
Dilo ez î vê sabir im
Dawî dilî me nava bû
Ez î xort bûm ez kal kirim

Bavo dîsa dayê dîsa
Werin sêri dilî min dîsa
Bavo dîsa dayê dîsa
Ketim nav çarmêxa Îsa

Hamîte Hanare

Nivîsîn: Îrfan Baysal

Li Swêdê bi îstatîstîkên nû perwerdeya kurdî û şiroveyeke giştî

Li Swêdê îstatîstîkên fermî yê dibistanê (pol 1-9) hatin weşandin. Di nav wan de îstatîstîkên perwerdeya kurdî jî hene. Li gor van îstatîstîkan, li Swêdê, ji pola yekê heta 9ê 9046 zarokên kurd ku mafdar in beşdarî perwerdeya kurdî bibin, hene. Ji wan 5745 beşdarî perwerdeya kurdî dibin. Ev wek rêjeyek ji %64 e. Hejmara zarokên pêşdibistan, lise û şagirdên ku beşdarî perwerdeya bi kurdî ango perwerdeya alîkarîyê dibin, ne di nav vê hejmarê de ye.

Ku mirov wan jî bihesibîne, hejmara zarok û ciwanên kurd yê ku li Swêdê beşdarî perwerdeya kurdî dibin di ser 8 hezarî re ne.

Li Swêdê 143 665 şagirdên ku bi 157 ziman û zaraveyên cihê dipeyivin û mafê wan yê beşdarbûna zimanê zikmakî bibin hene. Ji wan % 54,77, ango 78699 beşdarî perwerdeya zimanê zikmakî dibin.

Îstatîstîkên perwerdeyê, Dayreya Karûbarên Îstatîstîkan (SCB), amade dike. Her sal di dawiyê meha 10an de her mamoste bi awayê pirsînê ji şagirdên xwe dipirse, ka li malê bi kîjan zimanê dipeyivin. Her dibistan li gor beyanên mamosteyan formên îstatîstîkan tijî dike û ji SCBê re dişîne.

Li gor îstatîstîkên ku di meha 10an ya sala 2004ê de hatine amadekirin hejmara şagirdên kurd: (tablo 1)

Zarave	xwedîmaf*	beşdar	rêjeya beşdaran
kurmançî	5181	2894	%55,3
Soranî	3865	2881	%74,54
Hemû	9046	5745	%63,5

*Xwedîmaf: Li gor qanûna perwerdeyê, zarokên ku di mala xwe de, yan bi dê

yan bi bav yan jî bi herduyan re, bêyî swêdî bi zimanekî din diaxifin, mafdar in ku beşdarî perwerdeya zimanê zikmakî bibin.

Hejmar û rêjeya keç û kuran: (tablo 2)

Kurmancî

	xwedîmaf*	beşdar	rêjeya beşdaran
Keç	2398	1424	%59,4
Kur	2783	1470	%52,8

Wek ji van hejmaran jî diyar dibe, rêjeya keçên kurmancîxêf yên ku beşdarî perwerdeya kurdî dibin ji ya kuran bilindtir e. Ango meyla keçan pirtir li ser xwendina kurdî ye.

Li gor îstatîstîkên van heşt salên dawî, hejmara şagirdên kurd yên kurmancîxêf: (tablo 3)

Sal	xwedîmaf	beşdar	rêjeya beşdaran
1997	3441	1827	%53,2
1998	3904	2189	%56,0
1999	3864	2013	%52,0
2000	4330	2211	%51,0
2001	4507	2271	%50,3
2002	4832	2559	%52,9
2003	5111	2702	%52,8
2004	5181	2894	%55,8

Di van 8 salên dawî de, rêjeya zarokên kurd yên ku beşdarî perwerdeya kurdî dibin her tim li ser %50î re ye. Rêjeya nizmtir ya sala 2000î û ya bilindtir jî ya sala 1998 û 2004ê ye. Sedemên vê yekê em nizanin, lê rastîyek heye ku di van salên dawî de meyla rêjeya yên beşdar ber bi bilindbûnê ve ye. Lê divê ku kurd jî vê yekê bizanibin ku ev rewşa li Swêdê dikare weha berdeyam neke. Nimûneya fînîyan li

ber çavan e (Li tabloya 5ê binêre). Her ku diçe di vê civatê de dimehin. Loma êdî ew daxwaza zimanê dayikê kêr dibe.

Di van heşt salên dawî de, hejmara şagirdên ku di pola 9ê de kurdî xwendine û dibistan qedandine: (tablo 4)

Sal	kurmancî	soranî	hemû
1987	150	41	191
1988	173	61	234
1999	176	115	291
2000	192	147	339
2001	199	162	361
2002	192	192	384
2003	228	235	463
2004	290	273	563
Hemû	1600	1226	2826

Kurdî li Swêdê di nav 10 zimanên mezin de ye. Ku mirov hejmar û rêjeya çend zimanên ku di nav 10 zimanên mezin de ne bide ber hev, tabloyeke weha derdikeve holê:

Hejmar û rêjeya beşdarbûnê ya perwerdeya zimanê zikmakî ya çend zimanên mezin: (tablo 5)

Ziman	xwedîmaf	beşdar	rêjeya beşdaran
Erebî	24053	16014	%67
Farisî	6573	4182	%64
Fînî	9922	4111	%41
Îspanyolî	10074	5373	%53
Kurdî	9046	5745	%64
Tirkî	5187	3044	%59
Îngilîzî	7250	3556	%49

Îdiaya ku dibêje "kurd naxwazin bi zimanê xwe bixwînin", ne rast e.

Rêjeya beşdarên kurdî ji gelek zimanên din bilindtir e. Hetta ji zimanên ku îro

di dunyayê de gelek populer in, wek îngilîzî û îspanyolî, jî bilindtir e. Ev yek nîşan dide ku kurd di dibistanan de îmkânên xwendina zimanê xwe/bi zimanê xwe bi dest bixînin dê bixwazin bi zimanê xwe bixwînin.

Lewma îdiaya ku rayedarên dewleta Tirkîyê û kesên ku wek wan difikirin, dibêjin kurd naxwazin bi zimanê xwe bixwînin, ne rast e.

Wek tê zanîn, bi xêra Yekitiya Ewropayê, bi îmkânên gelek bi sînor kursên kurdî yê taybetî vebûn. Ji ber sedemên ku ev kurd bi her rengî bê derfet bûn, kurdan zêde alaqe nîşan nedan. Ku kurdî di dibistanan de, bi awayekî fermî bê xwendin û dewlet finansê bike dê kurd bi rêjeyê gelek bilind beşdarî perwerdeya bi kurdî bikin. Ku kurd li welatê wek Swêdê, li derveyî welatê xwe, bi rêjeya ji %64 beşdarî perwerdeya kurdî bibin, dê çima li welatê xwe bi rêjeyê hîn bilindtir beşdar nebîn. Li Swêdê kesên ku beşdarî perwerdeya kurdî dibin dikarin bibin tercuman, wergêr, mamoste, karmendên karûbarên civakî, rojnamevan û hwd. Ku li Kurdistana Bakur jî kesên ku bi kurdî bixwînin bikaribin bibin karmend û karker dê hema hema hemû kurd beşdarî perwerdeya bi kurdî bibin.

Çavkaniya îstatîstîkan: SCB
(Dayreya îstatîstîkan ya navendî ya Swêdê)



Xizan Şilan vê carê jî bi
PÊJNÊN LAŞÊ MIRÎ derket.
Pirtûk ji aliyê weşanên Apecê ve îsal
derketiye û 115 rûpel in.

*ez
li seqema zivistanên xopan
dergevanê ber deriyê
asoya havîngehên te me
di fala qehweya esmer de
li şewqa rûyê te yê fîncanî
digerim*

(paçeyek ji PÊJNÊN LAŞÊ MIRÎ)

1919-1923 YILLARI ARASINDA MUSTAFA KEMAL ATATÜRK'ÜN KÜRT MESELESİ KARŞISINDAKİ TUTUMU VE 1922 TARİHLİ KÜRT OTONOMİSİ KANUNUNUN METNİ

SABAH GHALİB

Soranice Kürtçesi'nden Türkçe'ye çeviri: Agit Khorshid Zaher

Birinci Dünya savaşının sona ermesinden ve Osmanlı İmparatorluğu'nun İtilaf Devletleri tarafından yenilgiye uğratılmasından sonra, İmparatorluğun önüne geçilmesinin yanında, Türk ulusunun bütün siyasi otoritesinin yok edilmesine yönelik ortada doğrudan ve korkutucu bir tehdit vardı.

Çok sayıda Türk siyasetçi, yüksek rütbeli subay ve aydın, savaşın gerçek sonuçlarını ve bunun geleceği üzerinde meydana getireceği felaketi çabuk anlamıştı. Bundan dolayı, kalma ve yok olma tehlikesi karşısında, devrim ve mücadelenin dışında önlerinde başka hiçbir yol kalmamıştı. Bu Türk'lerin gözü önündeki bir başka gerçek de, özgürlüğe ulaşmanın tek yolunun, Türk milliyetçiliği düşüncesi olduğuydu. Bundan dolayı acil ve zekice kendilerini toparladılar ve geniş çaplı bir özgürlük hareketini örgütlediler.

Dört yıl süren Birinci Dünya savaşında, Osmanlı Devleti'nde bulunan müslüman milletler arasında sadece Kürt'ler geleceklelerini düşünmemişti. Kürt'ler sadece bununla da kalmayıp, Genç Türk (Jön Türkler) Osmanlı'ların bahtını ve tahtını korumak adına tam bir samimiyet içinde, her taraftan çaba içindeydiler. Ancak, İtilaf Devletleri ile Osmanlı'lar arasında 30 Ekim 1918'de yapılan Mondros ateşkes anlaşması, Kürt'leri uyandırmış ve onlara bir umut bahşetmişti. Kürt ulusalcıları arasında kendilerini ulusal düşüncenin mirasçısı bilen çok sayıda faal genç ortaya çıktı. Bunlar birkaç kısımdan oluşuyordu. Bunlardan bir kısmı, Türk ve dinin bağlantı sebebi olduğu Pan-İslamist Türk Partisi taraftarıydı. Bir başka kısım, Sultan hükümetinde Türk görevlilerle çalışıyordu ve İngiltere'ye karşıydı. Üçüncü kısım, her iki tarafa bağlıydı. Dördüncü

kısım ise, hiçbir cihete bağlı değildi ve sadece Kürt'lerin özgürlüğü hedefine sahipti. Bu derli toplu olmayan durum, en baştan Türk milliyetçileri, Kürt'leri kendilerine destek ve Kürdistan'ı da kendilerine bir başvuru kalesi yapma düşüncesine götürdü. Çeşitli Türk milliyetçi grupları arasında, Mustafa Kemal'in hareketi hepsinden daha düzenli ve belirgindi. O, geçici bir süre için, Türk çıkarları için, Kürt'lerle dostluk ve stratejik bir ilişki kurabili.

Bu yazı, bir taraftan durumun başlıca esaslarından bahsederken, diğer taraftan da tarafları çözümlenmeye ve en sonunda da Atatürk'ün Kürt'ler karşısındaki tutumunu ve Kürt'lerin kendi kaderlerini belirleme hakkını gözler önüne koymaya çalışıyor. Atatürk'ün mirasından anlamak, Türkiye ile muamelede yer bulma konusunda Kürt siyasetçilere tam bir yardım verecektir.

1914'te, Birinci Dünya savaşı başlamadan önce, yukarı Afrika ve Balkan ülkelerinin tamamı, Ak Deniz ve Ege'de bulunan çok sayıda ada Osmanlı İmparatorluğu'nun elinden çıkmıştı. Bununla beraber, İngiltere zorbalığını Fars Körfezine dayatmıştı. Bütün bunlara ek olarak, Osmanlı Devleti, Avrupa'lı devletlere olan ağır borcun altında inliyordu. Mali-Ekonomik sistem 23 Aralık 1881'den itibaren

Uluslararası Borç Komisyonu tarafından yürütülüyordu.⁽¹⁾ Osmanlı'nın bu kötü durumu Osmanlı'yı bir kere daha savaş meydanına gitmeyi –özellikle de Avrupa'lı güçlere karşı- düşünemeyecek duruma getirmişti. Osmanlı'nın durumu, destek almaksızın kendi ayakları üzerinde duramayacağı bir seviyeye ulaştı. Bu amaçla Avrupa'lı bütün güçlü devletlerin kapısını çalıyordu. Ta ki Genç Türk'ler hükümetinin en üst düzey üç sorumlusu Talat Paşa, Enver Paşa ve Cemal Paşa gizlice, ümitsizce ve Bakanlar Kurulu'ndan habersiz bir şekilde Almanya'ya tenazülde bulunana kadar onlardan hiçbiri kapısını açmadı. Bu da onları büyük dünya savaşının cehennemine çekti. Dört yıl savaş, Osmanlı Devletini parçalayıp Osmanlı'yı ayakları üzerinde duramayacak hale getirdi. Osmanlı'ların Basra, Bağdat, Musul, Filistin, Şam ve Halep cephelerindeki yenilgisi, beyaz bezle teslim olmalarını, ümitsiz ve yenilgiye uğramış bir halde 30 ekim 1918'de ateşkes anlaşmasını imzalamalarını beraberinde getirdi.

Birinci Dünya savaşının sonunda, Genç Türk'ler iktidarı aşaması sona erdi ve bu aşama devleti, İtilaf Devletleri'nin bütün şartlarını kabul etmeye mecbur duruma getirdi. Bu açıdan ateşkes anlaşması, savaşta yenilen Türk için çok sert bir tehdit ve çok ağır bir anlaş-

maydı. Bu anlaşmanın yedinci maddesi, "İtilaf Devletlerine, güvenliklerini tehdit edecek bir durumun ortaya çıkması halinde herhangi bir stratejik yeri işgal etme hakkı vermişti"⁽²⁾

Savaşın sona ermesi barışı temin etmedi. Savaştan sonraki felaket, siyasi otoritenin kalmaması ve Türk varlığının otadan kaldırılması tehlikesi gündemden güne daha çok ortaya çıkarırken bu durum, Hüseyin-Mc Mohan Mutabakatı, Sykes-Picot Anlaşması ve Belfor Sözleşmesi gibi gizli anlaşmaların uygulanmasının yolunu açtı. Elbette bu anlaşmalar, Osmanlı İmparatorluğu'nun yeniden tasfiye edilmesi ve paylaşılması için yapmışlardı. Bu açıdan, Türk subayların, siyasilere ve halkın zihnindeki başlıca kaygı, nasıl halk ve devlet olarak ayakta kalmaktı? Bunun cevabı için çok sayıda düşünce ve inanç vardı. Bazıları o kadar ümitsizliğe düşmüşlerdi ki Amerika Başkanı Wilson'un 14 maddesinin gölgesinin altına girmeyi düşünüyordu. Türk Wilson Topluluğu'nun iki önerisi vardı: Bunlardan ilki, Amerika'nın Türk'leri kendi gözetimi altına almasını talep etmekte. Çoğu da Amerika'nın onları Avrupa'lı güçlerden korumasını talep ediyordu. Aşırı Türk milliyetçileri bunu kabul edemiyordu. Felaketler yavaş yavaş daha da yakınlaşıyor ve daha da geniş-

liyordu. İtalya, 1919'un Nisanı'nda, Antalya'dan ta Konya'ya kadar olan yerleri işgal etti. Yunanistan, aynı yılın Mayıs'ında Paris'te, Yüksek Konsey'in teşviki ve kararı ile İngiltere, Fransa ve Amerikan savaş gemilerinin gözetimi ve koruması altında, İzmir'i işgal edip ve burayı kendi toprağı olarak ilan etti. Bu umutsuzluk ve kötümserlik havasında güçlü ve metin bir adam, kendine ve gelecekteki kurtuluşa güvenen ve dönemi çok iyi anlayan bir general ortaya çıktı. Onun isteğı, hazırladığı planı günlük işlere uygulamaktı. Bu kimse, daha sonra Atatürk, yani Türk'lerin babası olarak, adlandırılacak olan Mustafa Kemal'di.

Mustafa Kemal, 17 Nisan 1919'da Osmanlı'nın doğu vilayetlerindeki güçlerinin müfettişliğine getirilir. Osmanlı ordusunun kalıntılarını silahlandırmak ve cephanelerini bırakmamak yerine o, gelip en iyi şekilde savunmaya dönük güçlü bir ordu oluşturmak ve ortak uyumla Türkiye'nin kurtarılması adına büyük bir iş gerçekleştirmek için direnişçi cemiyetlerle ilişki kurdu.⁽³⁾

Şam ve Halep'in işgal edilmesinden sonra, ki Mustafa Kemal Osmanlı'nın oradaki güçlerinin başındaydı, Osmanlı Devleti'nin yıkılışının yakınlaştığını çok iyi biliyordu. Patrik Kruz'un dediğı gibi, "Mustafa Kemal, günün yaklaştığını biliyordu. Kemal,

Şam ve Halep cephelerindeki yenilgi- den çok endişelenmedi, zira bu sonucu bekliyordu. Yeni bir Türk ulusunun doğuşunun yolda olduğunu ve bunun köklerinin, İtilaf Devletleri tarafından yeni yeni işgal edilen Suriye’de olmadığını biliyordu. Onun için önemli olan Anadolu’nun, yani Türkiye’nin merkezinin, selemette olması ve selamette kalmasıydı. Orası ve bu dağ silsilesinin arkası, eski günlerin beşiği ve Türk’ün geleceğinin devletidir.”⁽⁴⁾ Mustafa Kemal’in yeni Türkiye hakkındaki düşüncesi, Kürdistan bölgelerini de içine alacağını gösteriyor ki ona göre, buralar yeni Türkiye Devletinin bir parçası olmalı.

Mustafa Kemal, Türk olanlarla Türk olmayanlar arasındaki çizgiyi açık bir şekilde çizmişti. O, Türk için yaşıyordu. Türk olmayanlar için her hangi bir hesap yapılmıyordu. Ancak bu düşüncesi, toplum içinde açık bir şekilde ifade etmiyordu. Başta Türk olmayanları, hepsinden önce Kürt ve ondan sonra da İslam’ı, Türkiye’nin kurtuluşunun uzun sürecek olan savaşında kullanmak istiyordu. Zaman çok hassastı ve her türlü gevşeklik felaketin yükünü daha da ağırlaştırıyordu. Mustafa Kemal’in Türk halkına tam bir inancı vardı. İlk fırsattan itibaren, bu zor aşamada, kurtuluş için onlara liderlik yapabileceğini düşünüyordu.

Atatürk, azimle, doğuda ve Türkiye’nin diğer parçalarında Osmanlı güçlerinin yeniden örgütlenmesi gayreti içindeydi. Aynı zamanda, ortada olan diğer milli güçleri kendi amaçları etrafında toplamaya çalışıyordu. Birinci Dünya savaşından sonra ortaya çıkan seçilmiş Türk heyetinin, Osmanlı sisteminin Türk’leri kurtarabileceğine, müslümanların ve de müslüman olmayanların imparatorluğunun hayatta kalmasını sağlayabileceğine dair inancı kalmamıştı. Bundan dolayı onlar, Türkiye’ye tek ulus olarak bakıyorlardı. Bu ulus da Türk ulusuydu. Türk ordusu ve halkının dışında, ilk adımdan itibaren, Mustafa Kemal, Kürt halkını kendi tarafına çekmek istiyor ve Kürt’ün gerekli olduğunu çok iyi anlamıştı.

Mustafa Kemal’in bilgisi ve becerikliliği, Osmanlı’ların Diyarbakır’daki ikinci orduya bağlı bir tugayın başına geldiği 1916’nın Nisan ayına dayanıyor. Daha sonra bu ordunun komutanı olur ve 1917’nin Temmuz’una kadar orada kalır. Bu süre içinde, Osmanlı’nın Kürdistan’daki ordusunun üst düzey komutanı Kolonel Litvan İzzeddin, Kürt’ler hakkında tam bir uzmanlık edinir ve onların ulusal savaştaki önemi kendisi için ortaya çıkar. Bu cesur halkın Türkiye topraklarının korunmasında öne çıkarılmadığını görür. Onların, aynı zamanda, aşiret

reislerini dinlediklerini görür ve onları güvenilir bir müttefik olarak anlar. Bundan dolayı onlarla kuvvetli bir ilişki kurar ve onları Osmanlı ordusunun saflarında organize eder.⁽⁵⁾

Elbette Kürt, Osmanlı Devleti'nin 400 yılı boyunca bu devlete askerlik yapmamıştır ve resmi olarak Osmanlı ordusunun saflarına katılmamıştır. Ama belki bu durum, her zaman Osmanlı'ların hizmetinde olan az sayıdaki Kürt subayı içine almıyor. Ancak, Birinci Dünya savaşında, müslümanlık ruhu Kürt'leri, Türk'lerin imdadına koşacak ve orduya katılacak duruma getirdi. Kürt –Osmanlı ilişkileri işlerinin İngiliz uzmanlarından biri olan W.J.Childs, Sivas ve İskenderun körfezini dolaşmış, 15 aydan fazla bir sürede 1500 mil dolaşmış ve Kürt'ler hakkında iyi bir uzmanlık edinmiş ve çok iyi bir bilgi toplamıştı. İngiltere'de, Kral Meclisi'nde, 12 Nisan 1916'da düzenlenen bir konferansta yaptığı konuşmada şöyle diyor: *“Kürt halkı, nizami Osmanlı ordusuna katılmaz. Bunun açık sebebi, devletin kendisi için onları askerlik yapmaya mecbur bırakmasıdır. Meselenin harcama ve parayla ilgisi yoktur. Türkiye Savaş Bakanlığı, Kürt'leri kendi ordularının saflarına katmaktan mutlu olur. Ancak bunun için, bu işi yapsa o zaman bir iç savaşa bulaşır. Çünkü Kürt'ler, Türk otoritesi*

için öyle kolay bir şekilde öne çıkmazlar. Doğu Anadolu'da, çok sayıda Kürt topluluğu arasında, Sultan'ın yazılı emirleri uygulanmaz ve okunmaz. Bu bölgelere yanında bir Türk memurun ya da yardımcının olması yerine yalnız olarak yolculuk yapman çok daha iyidir. Resmi Türk memurundan duydum ve şunu diyordu: “3-4 bin Dersim Kürdü'nün silahsızlandırılması planı vardı. Bunun için, bizim 50 bin askere ihtiyacımız vardı. Diğer Kürt'ler'den hiç bahsetme onların istenen durumu getirilmesi çok daha zordur.” Bundan dolayı Kürt'ler, gidip Osmanlı Devletinin resmi ordusuna katılmak için asla tenazülde bulunmadı. Devlet, onları aşiretler yoluyla gayr-ı nizami süvari yapıyor. Bu da, her zaman istedikleri kolaylıkta başa gitmedi. Gayr-ı nizami oldukları zaman da çoğunlukla öyle bir hizmette de bulunmadılar”⁽⁶⁾

İzmir'in ve çevresinin, Yunanlı'lar tarafından işgal edilışinden dört gün sonra, 19 Mayıs 1919'da, Mustafa Kemal, Samsun limanında, Kardeniz'de⁽⁷⁾ demirler ve Türk miliyetçilik hareketini örgütlemeye başlar.

Mustafa Kemal'in verdiği mücadele, Türk'ün kurtuluşu ve Türkiye Cumhuriyeti'nin kurulması içindi. Atatürk, bu amacın gerçekleşmesi adına şöyle: *“Dış siyasetin temeli dahili siyasi gücün üzerinde kuruldu. Bu da,*

dahili idari güç ve dahili örgütlenmeyi gerçekleştirir. Bu açıdan, bakıldığında dahili siyaset ile dış siyasetin her zaman birbirine bağlanması gerekiyor."⁽⁸⁾

Bu konuda, Mustafa Kemal'in hareketinin iç siyaseti, hareketle ilişki kurmaları ve Türkiye'nin kurtuluşu amacıyla beraber mücadele etmeleri için, Kürt'lerle ilişkiye geçmeye başlar. Mustafa Kemal, yapacağı her çalışmadan önce, 28 Mayıs 1919'da dört Kürt aşiret reisine, ki bunlardan biri Hacı Musa Mutki'ydi, bir telgraf çeker, kendisinin Sultan tarafından atandığından ve yakın bir zamanda Kürdistan'ı ziyaret etmek istediğinden bahseder ve aynı zamanda Türkiye'nin işgalci Avrupa'lıların elinden kurtuluşu için, Türkiye Kurtuluş Savaşı'nda onlardan destek ister.⁽⁹⁾ Ve yine aynı gün, Osmanlı Parlemantosunda Kürt üye olan ve Diyarbakır'daki Kürt Derneği'nin üyelerinden biri olan Kamil'e bir telgraf çeker. Mustafa Kemal, telegrafta, Kürt ve Türk arasındaki her nefret ve düşmanlığın felakete sonuçlanacağı konusunda Kamil'i haberdar eder ve bundan dolayı da iki millet arasındaki birlik ve kardeşliğin korunmasını ister.⁽¹⁰⁾

Bundan da fazlası, 11 Haziran 1919'da, Diyarbakır'lı Cemil Paşazade'nin yoluyla Kürt'lere bir mesaj gönderir ve onlara açıkça şunu yazar:

"İngiltere, bağımsız Kürdistan haritasını Ermeni'lerin çıkarına kurban ediyor. Kürt'ler ve Türk'ler birbirlerinin gerçek kardeşleridir ve birbirlerinden ayrılmaları mümkün değildir. Bizim varlığımızın Kürt'lerin, Türk'lerin ve bütün müslümanların yardımına ihtiyacı var. Genel olarak heppimiz bağımsızlığımızı korumalıyız ve ülkemizin bölünmesine izin vermemeliyiz. Ben Kürt'lere, Osmanlı Devletinin parçalanmaması şartı ile, onların gelişmesine ve ilerlemesine vesile olacak bütün hak ve ayrıcalığın (Hukuk ve İmtiyaz) verilmesinin yanındayım."⁽¹¹⁾

Mustafa Kemal'in bu mesajdan maksadı bir taraftan İngiltere'nin Kürt'leri etkilemesine yol vermemek ve onları İngiliz iktidarının elinin altından çıkarmak bir diğer taraftan da onları, Ermeni'lere destek vermeyecekleri bir hale getirmek ve en sonunda da onları Türk ulus devletinin kurulmasına destek vermeleri için kullanmaktı.

18'den ta 22 Haziran 1919'a kadar, Mustafa Kemal güvenilir dostlarıyla, mücadele hareketinden bahsetmek üzere Amasya'da toplanır. Orada, kendisi, Türkiye'nin kurtuluşu için baştan başa bir ayaklanmaya geçilmesi kararını yayar. Aynı zamanda, eğer gerekirse Ankara'da geçici bir hükümet kurmaya karar verirler. Ali Fuad'ın deyişiyle bu, kurtuluşun ve Türk devletinin kuruluşunun başlangıcıydı.⁽¹²⁾

1919'un kışında, Kemal'in hareketi, iç ve dış düzeyde çok yönlü bir ilişki kurmuştu. Hareketin gelişmesinin en önemli sebeplerinden biri, Kemal ile Bolşevik'ler dostluğunun kurulmasıydı. Sovyetler, Anadolu'da Ermenistan ve Kürdistan devletlerinin kurulmasına mücadele edilmemesi için müttefiklere karşı Türkiye'ye gizli bir söz vermişti. Değil Kürt'ler ulusalı Türk'lere ya da Bolşevik'lere yardım etsinler ama bu, İngiliz'ler için bir korku meydana getirdi. Ve sonuçta her ikisi de Kürt'lerin içinde yayıldı ve durum öyle bir hal aldı ki Nusaybin ve Nusaybin'in etrafındaki halk açıkça şunu diyordu: *"Biz, Bolşevikiz ve biz kendi kendimizi yöneteceğiz. Yabancı güçler (İngiliz ve Fransa- S. G) burada hükümdarlık yapamaz"*⁽¹³⁾

Türk –Kürt Ulusal Pakti

Mustafa Kemal, Kürt'ler'den 23 Temmuz 1919'da Erzurum'da yapılacak Doğu Vilayetleri Kongresi'ne hazır olmalarını ister. Bitlis, Van ve Erzurum'un bir çok bölgesinden temsilciler gider ancak bunlar önemli insanlar değillerdi. Bunlar daha çok Osmanlı'lar tarafından oralara yerleştirilen molla ve memurlardı. Bir diğer anlamda, Kürt'lerin gerçek temsilcileri değillerdi. Bu kongre, başlıca iki görev üstlenmişti. Bunlardan biri temsilciler komis-

yonunun ve Mustafa Kemal'in rehberi olacağı başkanlık seçimiydi. İkincisi de Ulusal Pakt'ın (National Pact) yayımlanmasıydı. Bu paktın ilk maddesi aşağıda geçtiği şekilde başlıyor:

"Erzurum, Trabzon, Samsun, Sivas, Diyarbakır, Mermuretulaziz, Van ve Bitlis vilayetleri tek parçadır ve hiçbir şekilde Osmanlı topraklarından ayrılmaz."⁽¹⁴⁾ Bundan daha fazlası Kongre, azınlıklara hiçbir özel hak verilmeyeceğini bundan dolayı Avrupa'lı ülkelerin Türkiye'nin bölünmesinden elini çekmesi gerektiğini bildirdi.⁽¹⁵⁾

Sözkonusu pakt, bazı haklar elde etme umudunda olan Kürt'ler için, kötümserliğe ve endişeye neden oldu. Bunun içinde onlar için hiçbir şey yoktu. Bu Mustafa Kemal'in arzusuyla tam uyuyordu. Kuzey Kürdistan'ın bütün topraklarını Türk ulusu olarak kaydediyordu. Mustafa Kemal açısından önem verilmesi gereken, 30 Ekim 1918 yılında imzalanan ateşkes anlaşmasından önce Osmanlı'lının hükümü altında kalan Musul Vilayeti'yle beraber bütün bu bölgelerin korunmasıydı. Kürt siyasetinin başındakilerin kafası Atatürk'ün ve Avrupa ülkelerinin siyasetini almıyordu. Onlar daha çok onun bunun sözlü sözüyle yetiniyorlardı.

Mustafa Kemal'in en yakın yaveri İsmet İnönü bir zaman diyordu

ki: "Türkiye'nin gelecekteki cumhuriyeti, Kürt-Türk ulusudur" (16) Kürt'ler buna inanıyorlardı ve Türkiye'nin özgürlüğü için ellerinden geleni esirgemiyorlardı.

Hileyle karışık, sözlerinin yanında Mustafa Kemal, Kürd'ün çıkarını etkisizleştirmek için hiçbir fırsatı elinden kaçırmıyordu. İngiltere, 1919'un yazında, Kürt'lerin kapasitesi ve uygunluğundan uzmanlık edinmek niyetiyle, Kürt Lawrance olarak tanınan E.W.C. Noel'i Kürdistan'a gönderir ta ki eğer mümkünse Kürt'ler için bir Devlet kurulsun.(17) Noel, Kürdistan Devleti'nin kurulması adına elinden geldiğince en fazla çalışan İngiliz subaylardan biriydi. 13 Haziran 1919'da, İngiltere'nin Bağdat'taki üst düzey yüksek temsilcisinin organizatörü Kolonel Wilson, Bağımsız bir Kürdistan Devleti'nin kurulması için İngiltere hükümetine bir öneride bulunur. Öneride, Bağımsız Kürdistan Devleti Van, Bitlis, Diyarbakır ve Elazığ vilayetlerinden ibareti. Noel, Wilson'a danışarak İstanbul'a gitmeye karar verir ta ki Bedirhanlar ailesiyle toplansın ve onlardan bir ikisi ve güç sahibi bazı Kürt'lerle, Pan-İslamist Türk'lerin, Kürt'leri İngiliz'lerin Ermeni'lere onların topraklarına el koymasına için yardım ettiği bahanesiyle, İngiliz'lere karşı çıkmaya teşvik eden propakanda-

larına karşı çalışmak için beraberce Kürdistan'a gitsinler.(18) Aynı bakış açısıyla Noel, Türk'ün Diyarbakır, Van ve Bitlis'te oturanların büyük bir çoğunluğunun Türk olduğu ile ilgili inancını takip etti. O ki Kürdistan'ın bütün bölgelerini dolaşmış ve kendinden emin bir şekilde Türk'lerin inancının yanlış olduğunu, bu bölgelerde tek bir tane Türk köyünün olmadığını ve şehirlerde bazı Türk memur ve bazı dükkan sahibi olanların dışında başka hiçbir yerde Türk olmadığını bildiriyordu. Noel, 1919'un Haziranı'nda, Osmanlı İmparatorluğunun geleceği konusunda iki öneride bulunur: Bunlardan biri şuydu: İngiltere'nin gölgesi altında Kürdistan devleti tanınsın ve bu devlete İngiltere tarafından yol gösterilsin.(19) Başlangıçta Noel'in en öncelikli işi Kürt'leri Kemalist'lere karşı yöreklendirmek, Mustafa Kemal ve yardımcılarını yakalamaya çalışmaktı.(20) Noel'in bu gezisi, Kemalist Türk'lerin sert şikayet ve yakınmalarına neden olur. Onlar açısından, Kürt meselesi dahili bir meseledir ve Noel'i de Kürt'ler arasında ayrılık ruhunu yaymayı istemekle suçlarlar.(21) Noel'in, Kuzey Kürdistan'daki ziyaretine Özellikle Celadet Bedirhan ve Kamran Bedirhan başta olmak üzere Bedirhaniler yardımcı olur. Bu haber Mustafa Kemal'e ulaştığında onlara ça-

bucak hücum eder, bu girişimden birşey çıkmasına izin vermez ve bununla beraber Noel ve arkadaşlarının tutuklanması için emir çıkarır. Bu işte bazı Kürt aşiret reisleri de Mustafa Kemal'e rehberlik ve yardım ederler. Onlar emrin çıkmasından sonra Sivas'ta bulunan Mustafa Kemal'e bir destek mesajı gönderirler.⁽²²⁾ Noel ve arkadaşları da herbiri bir yerden geçerler.

Mustafa Kemal, 16 Haziran 1919'da, Osmanlıların Erzurum'da bulunan 15.Tugay Komutanı General Kazım Karabekir'e gönderdiği bir telegrafta Kürt'lere karşı düşmanca tepkisini ifade eder ve şunu yazar: "İngiltere'nin desteği ile Kürdistan Devleti'ni kurmak isteyen Diyarbakır'daki Kürt Derneği kapatıldı. Kürt Derneği kaç tane "Serseri" tarafından kuruldu ve Kürt'leri temsil etmiyor." Mustafa Kemal daha da ileri gider ve Kürt'lere gerçek bir kardeş olarak kucak açmaya ve hep beraber savunma saflarında ve ulusal hak için çalışmaya karar verdiğini söyler.⁽²³⁾ İki gün sonra, Edirne'de bulunan 1.Milli Tugay Komutanı Cafer Tayyar'a bir telgraf yollar ve mesajında şöyle yazar: "İngiltere'nin sayesinde, Bağımsız Kürdistan'ın kurulması propagandası ve bu projeye destek tam olarak ortadan kalktı ve Kürt'lerde tamamiyle Türk güçlerine bağlandılar."⁽²⁴⁾ Mustafa Kemal, 23 Haziran'da da, İstanbul'da bulu-

nan Osmanlı güçlerinin Genelkurmay Başkanı Cevad Çobanlı'ya bir telgraf yollar ve bu telgrafta, İngiltere gözetiminde kurulacak Bağımsız Kürdistan projesinin bozulduğu müjdesini verir.⁽²⁵⁾ Burada çok açıkça görülüyor ki Mustafa Kemal, Türk Milletinin yükselişi için mekezi devletle ilişkilerini tamamiye koparmamıştır.

1919'un 4 Eylülünde, Sivas kongresi açıldı ve Kongre'de Mustafa Kemal ve arkadaşlarıyla beraber sadece 38 kişi hazır bulundu. Kongre'ye Osmanlılar döneminde eski bir yönetici olan Mezhar Mufti'nin dışında, ki o da Hakkari'yi temsilen katılmıştı, hiçbir Kürt temsilci katılmadı.

Diyarbakır temsilcisi adına giden İhsan Hamid de oraya yetiştiğinde Kongre sona ermişti. İhsan Hamid, Sadullah Efendi ve Hacı Musa Mutki, 12 üyeden oluşan başkanlık konseyine üye oldular.⁽²⁶⁾ Mustafa Kemal, çok sayıda Kürt aşiret reisini kendi tarafına çekebildi. Aynı zamanda, orada burada bulunan Kürt hareketlerini de ortadan kaldırdı.

Mustafa Kemal, yerini güçlendikçe İstanbul'dan daha büyük taleplerde bulunuyordu. İstanbul Başbakanı Ali Rıza Paşa, 1919'un Ekimi'nde, Mustafa Kemal ve arkadaşlarını görmesi için Deniz Bakanı'nı Amasya'ya gönderdi. 20-22 Ekim'de yapılan görüşme-

lerin sonucunda, Amasya Protokolü olarak bilinen bir protokol imzalarlar. Buna göre, Merkezi hükümet Erzurum ve Sivas kongrelerinin bütün maddelerini kabul edecek.⁽²⁷⁾ Elbette bu iki Türk tarafın tutumu Kürt'lere hiçbir umut bırakmadı. Her ikisi de Kürt'lere karşı düşmanca bir düşünce içine girdiler. Kürt de bu konudan habersizdi. Değil sadece bu, belki Kemalist Türk'ler, Sultan hükümeti ve özellikle İngiltere ve Yunan başta olmak üzere müttefikler arasında da bölündüler. Bunlar birkaç taraftılar ve hiçbiri birbirini anlamıyordu.

Aralık 1919'da, Sultan'dan, İstanbul Parlemantosunu için gerçek bir seçim yapılması talebinde bulundu. Sultan 6.Muhammed buna razı oldu. 1920'nin ilk ayında, en çok parlamento üyesi Mustafa Kemal'in taraftarlığını yapan ulusalcılardan çıktı. İlk iş olarak, Sivas ve Erzurum anlaşmalarını temel alan Ulusal Paktı çıkardılar. Kürt'lerle doğrudan bağlantısı olan Pakt'ın ilk maddesi şöyle diyor: "Çoğunluğu Osmanlı müslümanlarının oturduğu bölgelerin beraberce kader birlikleri var. Ancak yabancıların işgali altında bulunan Arap bölgelerin durmuna genel bir oylama ile karar verilecek."⁽²⁸⁾ Mustafa Kemal, bununla, Türkiye'nin özgürlüğünün temelini sabitleştirdi. Arap toprakla-

rı dışında, Kürt'ler dahil genel olarak müslümanların topraklarını gelecekteki Türk devletinin sınırları içine aldı. Mustafa Kemal, bu şekilde, Kürt meselesine büyük bir darbe vurabilirdi. Kürdistan topraklarını ve Osmanlı Kürdünü Türkiye ve Türk olarak kaydederken Kürt'ler için en zor ulusal sorununu meydana getirmeyi de başarabilirdi. Her ne kadar Kürdistan topraklarının hepsi Türkiye olmadıysa da ancak en büyük parçası Türkiye tarafından işgal edildi.

Ve yine bu dolaylarda, yani 1919'da, Kürt Teali Cemiyeti, ki 12 Aralık 1918'de kurulmuştu, Kürdistan Devleti'nin kurulması için uluslararası destek bulmaya çalıştı. Damat Ferit Paşa hükümeti, onlara bir takvim sunmak için, bu organizasyonun temsilcileriyle toplanma isteğinde bulundu. 1919'un 10 Temmuz'unda, Osmanlı Devleti'nin temsilcileri Deniz Kuvvetleri Bakanı Avni Paşa, Önceki Şeyhulislam Haydar Efendi (İbrahim Efendi Heyderi-S.G) ve Önceki Savaş Bakanı Ahmet Ebuk Paşa, Kürdistan Teali Cemiyeti'nin üyelerinden Şeyh Abdulkadir Şemzini, Emin Ali Bedirhan, Mevlanazade Rafet Yüzbaşı Emin ve Kolonel Avni ile toplandı. İngiltere Dışişleri Bakanlığı'nın bir belgesine göre, 21 Temmuz 1919'da cemiyetin İngiliz'lerle yaptığı bir top-

lantıda onlara, Osmanlı Devleti'nin izni olmadan onlarla nasıl toplandıkları soruluyor. Buna cevaben Mevlanazade Rafet şöyle diyor: *'Wilson ilkelerine göre, bütün ulusların kendi mutlulukları için çalışmaya hakkı var... Kürt, sadece bir gücün Kürd'ün özgürlüğünü ve güvenliğini temin edebileceğini düşünüyor. İngiltere büyüktür. Bundan dolayı, bu niyet için İngiltere'ye talepte bulunmayı olumlu görüyor. Mevlanazade Rafet İngiliz'ler karşısında şunu soruyor: Türkiye hükümeti, kendi geleceğinden emin değilken Kürd'e nasıl otonomi verebilir'* (29)

